# Xwebûn ket 2 saliya xwe

Ji bo em 'xwebûn'a xwe pêk bînin, salek berê me dest bi rêwitiyê kir. Me gotibû xwezanîn û xwebûn bingeha hemû zanebûnan e. Em hê jî wek roja ewil bi kelecan in. Ger zimanê te birîndar û qedexe be bêguman wê demê têkoşîna ji bo vî zimanî tê dayîn jiyanê watedartir dike. Em bi zimanekî ku bi hezaran sal in hebûna xwe diparêze weşanê dikin. Di hejmara yekemîn a rojnameyê de jî me bal kişand ser yekitiya neteweyî. Mijara yekitiya neteweyî îro ji her demê girîngtir e û divê em ji neyarên kurdan ku ji bo kurdan parçe bikin bi şev û roj dixebitin, zêdetir ji bo yekitiyê têbikoşin. Bi hêviya welatek azad û yekbûna çar parçeyan, salvegera rojnameyê li hemû gelê kurd pîroz be!





SARYA DENÎZ

## Salvegera Xwebûnê pîroz be!... *R.3*

xwebûn

21-27 KANÛN 2020 HEJMAR: 53 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org

# Girtî bi greva birçîbûnê dikevin sala nû



Li 130 girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê girtiyan ji bo tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan were rakirin dest bi greva birçîbûnê ya dorveger û bêdem kirin û grev di hefteya 4'emîn de ye. Girtiyan bang li hemû kesan kir ku piştgiriyê bidin çalakiya wan û malbatan got ku ew piştgiriyê didin grevê. Her wiha girtiyan hişyariya greva bêdorveger kir. Li Stenbolê koma ku xwest bi daxuyaniyê piştgiriya xwe bîne ziman rastî êrîşa polîsan hat û gelek kes hatin binçavkirin... ***R.3***

## Jin her tim li qadan bûn

Sala 2020'an ji bo zêdekirina destkeftiyên jinan saleke girîng bû. Bi têkoşîna xwe re jinan îsal jî nîşan da ku ew ê dest ji têkoşînê bernedin û bêrawestan bi fedakariyeke mezin li ber xwe bidin. Sedsala 21'emîn sedsala jinê ye, ev gotin ev demek e li ser zimanê her kesî ye. Dîmenên îsal jî ev rastî derxist holê... ***Eylem Şoreş / R.2***

# Asîmîlasyon daxa dil e

Mamoste û zimannas Reşo Zîlan bi salan e di hemû jiyana xwe de kedeke mezin ji bo zimanê kurdî daye û hê jî kar û xebatên xwe didomîne. Reşo Zîlan ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Mixabin asîmîlasyon daxa dil e. Di van 40-50 salên dawî de, li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê kurmancî û her wiha zaravayê me yê kirmanckî jî pir bi xurtî dibişivin, asîmîle dibe. Berî her tiştî ziman ji mezinan ji bo biçûkan mîras namîne. Yanî ji mezinan derbasî zarokan nabe. Ev yekser mirina zimanekî ye. Em zimanê xwe bi destê xwe dikujin. Bi awayekî sîstematîk asîmîlekirina kurdan li dar e."... ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4***



*Li Colemêrgê destûra 'qismî' û 'ambargo'*

*Li Kurdistanê pêkanînên salên 1990'î û rewşa awarte bi dawî nebûn. Şêniyên gundên li newalên li dor rêya Colemêrg-Çelê, saet di navbera 08.00-17.00'de dikarin biçin gundên xwe. Her wiha welatî nikarin têra xwe lazmatiyên xwe bibin malê, ji lewra kotayek hatiye danîn. Li gundên ku têketin û derketina wan ketine ber destûra "qismî" jî di sê salên dawî de bi "ambargoyeke" giran re rû bi rû mane.*

## Qeyrana hevalcêwî: Şer û Aborî

Çîroka şaristaniyê bi awayekî dîroka şer e. Pêkan e, bê pirsîn ku gelo bi saya şer mîrovahî bi pêş ket? An jî çima şer diqewimin? Ma şer her gav neyînî ye? Gelo dewsa ew rê û dirbên şer neçar dikin, tiştekî din jî mimkun e? Belê rêzkirina pirsên cuda jî pekan e, lê ya pêwîst bersiv in. Dev ji dehan pirsan berdin, tenê ji bo pirsekê bi sedan, bi hezaran bersiv mimkun e. Jixwe, heke her beşa zanistê li gor dîtin, têgîn û rêbaza xwe bibe bersiv, ji niha ve 3 hezarî zêdetir bersiv amade ne. Rawernas dikarin bibêjin mîrovahî ji hevxwarina heywanan bi riya çavdêriyê hînbûn e ku şer hin tiştan diguherîne. Bi nêçîrvaniyê hînî kuştinê bûne...
***Ehmed Pelda / R.7***

## Xwestina edaletê jî qedexe ye

Li navçeya Pirsûsê ya Rihayê beriya hilbijartina giştî ya 24'ê hezîrana 2018'an xizm û alîgirên parlamenterê AKP'ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz êrişî kargeha malbata Şenyaşar kiribûn. Di êrîşê de Hecî Esvet Şenyaşar û lawên wî Celal û Adil Şenyaşar hatibûn kuştin. Emîne Şenyaşar a hevjînê xwe û du lawên xwe ji dest dan, bi lawê xwe Ferît Şenyaşar re ku ji êrîşê bi birîndarî rizgar bûbû, çend roj berê bi daxwaza edaletê li ber avahiya AKP'ê ya Rihayê xwestin çalakiya rûniştinê li dar bixin, lê Emîne Şenyaşar û kurê wê hatin binçavkirin û piştre bi şertê kontrola edlî hatin berdan... ***R.3***

## 'Bi me serbilind bin'

Cizîrê li hemberî hemû hovîtiyan 79 rojan li ber xwe da û serî netewand, lê mixabin dagirkeran dor lê girtin û çûnûhatina bajêr jî nebû. Lewma xwarin û vexwarin qediyabû. Ji bo berxwedêran jî ti alîkarî nebû û lojîstîka van jî qediyabû. Teslîmbûn di ferhenga berxwedêran de nebû. Hinek berxwedêran guleya xwe ya dawî ji bo xwe bi kar anî. Hinekan jî heta dawiyê li ber xwe da û jiyana xwe ji dest dan. Yên herî dawî jî bi telefonan xwe gihandin televîzyonan û gotin: "Bi me ser bilind bin". Ji ber ku wan wehşeta dagirkeran bi çavên xwe dîtibû...
***Hisên Çatikkaş / R.8***

## Dêrsim û Asîmîlasyon

Dêrsim, riyê kamayis û îtîqatê xo ra her waxt binê serdestan der a. Dêrsim de kirmanckî û kurmanckî yenê qiseykerdene. Hama hama sûke de kurdî weşiye kenê. Her waxt gorê raştiya şarî xoseriya xo esta. Bi se-serran o ke na kamiya şarî binê zilm û zorvajiye der a. Terteleyan ra heta surgin, kistene, vesnayena dewan bara xo pêro xiravîyan ra gureto. Onca kî dewlete tol nêvindena. Qomê Dêrsimi dustê pêro zorvajiyan de hem îtîqatê xo, hem kî zonê xo heta roza ewroyîne ard. En jêde kî na bara pîlan, bara kokimanê Dêrsim bî. Nika roza ewroyîne, na se-serra 21'yîne de niyadîme... ***Meral Ozel / R.9***

## Şeva Yelda

Li Kurdistanê û gelek welatên Rojhilata Navîn her sal di 21'ê kanûnê de Şeva Yelda tê pîrozkirin. Şeva Yelda niha zêdetir li rojhilat û başûrê Kurdistanê tê pîrozkirin. Piştî ku roj diçe ava û cihê xwe ji şevê re dihêle, malbat li dora sifreyek ku bi gelek xwarin, vexwarin, fêkî û çerezan hatiye xemlandin kom dibin. Pranî jî ew xwarin û vexwarin in ku di herêma lê dijîn tên berhemanîn. Mînak hinar, gûz, tirî, mewîj, hêjîrên hişk û şîrînahî. Hemû berhemên bi keda çar demsalan hatine komkirin... ***Şaswar Mame / R.12***



## Armanc têkbirina gelê kurd e

Hevdîtina Erdogan û Kazimî ji bo kurdan wê çi bi xwe re bîne em ê bibînin, lê ew çi biryarê bigirin jî di bingeha biryara wan de hevkariya PDK'ê heye. Baş dizanin ku bêyî PDK'ê ne mimkun e bikaribin civaka kurd têk bibin. Lewma dixwazin tifaqê ji hundir ve têk bibin... ***Felemez Ulug / R.6***

## Ev ne şerê kurdan e

Şandeya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) di 20'ê mijdarê de bi boneya aloziya di navbera hêzên kurdî de, bi rêya diyalogê bê çareserkirin dest bi hevdîtinan kiribû. Şandeya ku li başûrê Kurdistanê ji bo çareseriyê rê li diyalogê vebike xebatên xwe didomîne. Hefteya borî şandeyê ji ber rîska mezin a şer bang li her du aliyan kir ku berê xwe bidin diyalogê û bang li gerîla û pêşmergeyan kiribû ku 'xwe ji şer vegirin'. Endamê Şandeya KNK'ê û Hevserokê KNK'ê Ahmed Qeremûs têkildarî hewldanên KNK'ê yên ji bo pêşîgirtina şerê di navbera hêzên kurdî de axivî. Qeremûs diyar kir ku 'ev şer ne yê kurdan e, şerê dagirkeran e.' Piştî bûyera êrîşa hêzên PDK'ê ya li ser hêzên PKK'ê wezîrê pêşmergeyan Serbest Lezgîn îdia kiribû ku YPG'ê êrîşî hêzên pêşmergeyan kiriye. YPG'ê têkildarî mijarê daxuyanî da... ***R.7***

# Li meydanan bûn dê li meydanan bin

Eylem Şoreş




jSedsala 21'emîn sedsala jinê ye, ev gotin ev demek e li ser zimanê her kesê ye. Dîmenên îsal jî ev rastî derxist holê.

Bêguman, mijareke ji salekê dirêjtir û kurtir e lê ji bo destpêkê em ê jiyan ango têkoşîna jinan a sala 2020'an bînin bîra xwe.

Sala 2020'an kêm maye derbas bibe, bi wê re jî ji sedî 20'ê sedsalê. Sala 2020'an ji bo zêdekirina destkeftiyên jinan saleke girîng bû. Bi têkoşîna xwe re jinan îsal jî nîşan da ku ew ê dest ji têkoşînê bernedin û bêrawest bi fedakariyeke mezin li ber xwe bidin.

Yek ji armancên sereke yên îsal jî şikandina pergala tecrîdê ya li Îmraliyê bû. Tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û pê re jî tecrîda li ser tevahî civakê, piştî grevên birçîbûnê yên sala 2019'an, careke din hat şidandin û hewl tê dayîn têkiliya bi civakê û bi taybetî jinan bê qutkirin. Siyasetmedar Zozan Çewlîk di nirxandina xwe ya sersala 2020'an de diyar kiribû ku şikandina tecrîdê û hilweşandina pergala Îmraliyê yek ji mezintirîn hedefên jinan e. Li ser vê peyamê, ji destpêka salê ve çalakiyên curbicur ên weke meşên dirêj û grevên birçîbûnê ji bo azadiya Ocalan didomin.

Fermandariya YPJ'ê jî bi wesîleya salvegerê daxuyaniyek dabû û ji bo sala 2019'an gotibû, sala 2019'an ji bo jinên têkoşer û mirovahiya azadîxwaz bûye sala berxwedan û bilindkirina hêviya serkeftinê. Bi vê re dikare were gotin, sala 2019'an bû sala hêviyê, 2020'an jî sala mohrkirina destkeftiyên bingehîn.

Destpêka salê jinên kurd li her derê şoreşgerên nemir, şehîdên Silopyayê bi bîr anîn. 5'ê Çileya 2015'an Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Ûyar ji ber pêşengiya xwe ya serhildana xwe bûn hedefên dewleta tirk û hatin şehîdxistin. Jinan îsal soza xwe ya şopandina xeta têkoşînê ya 3 şehîdên Silopyayê nû kir.

**Li ser şopa Clara Zetkînan**

Jin bi yekitiya xwe li her derê bi îdîayên mezin gavên guhertinê diavêjin. Îsal jî di 8'ê Adarê de li her dera cîhanê tevî qedexeyên bi hinceta vîrûsa koronayê jî jinên têkoşer ji bo mafên xwe yên bingehîn ku ji jinan re weke xelat tên pêşandan, li meydanan bûn. Wan dengê xwe bilind kir û dikin jî. Çalakiyên 8'ê Adarê di dawiya meha sibatê de hatin destpêkirin. Navendên çalakiyên 8'ê Adarê yên îsal tevî Kurdistan û Tirkiyeyê, Îngilistan, Fransa, Swîsre, Almanya, Pakistan, Hindistan, Spanya, Yewnanistan, Awustralya, Awusturya, Filîpîn, Çîn, Perû, Arjantîn, Meksîka, Norwêç, Swêd û dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bûn.

**Pirsên li ser pergala hevserokatiyê**

Ger tundî li malê tê vegotin divê qala tundiya dewletê ya di siyasetê de jî were nirxandin. Qirkirinên siyasî bi awayekî sîstematîk li Tirkiyeyê didomin. Îsal jî polîsan, li gelek bajaran bi ser malan de girtin, lêgerîn ango talan kirin û bi sedan kes jî binçavkirin û girtin. Hedefên wan êrîşên qirkirinê di serî de jin bûn. Meha sibatê berdevka Komîsyona Mafên Mirovan û Hiqûqê ya HDP'ê Ayşe Acar Başaran di daxuyaniyekê de qala 99 binçavkirinên di nav du rojan de kir û êrîşên siyasî di nav vê salê de bênavber domiyan. Jinên HDP û Tevgera Jinên Azad (TJA) li dijî van êrîşan gotin, 'em ê ji bo parastina gelê xwe, têkoşîna xwe heta dawî bi awayekî xurt bidomînin.'

Di operasyonên qirkirina siyasî de pirsên weke;

'We çima 8'ê Adarê organîze kir?

Hûn çima mafê jinan diparêzin?

Hûn çima dibêjin aştî?

Hûn çima dixwazin tecrîd bi dawî bibe?

Hûn çima pergala hevserokatiyê diparêzin?

Hûn çima dibêjin Gulistan Doku li ku ye?' hatin pirsîn.

Yek ji sedemên ku kuştin û tundiya li jinan îsal jî zêde bû qanûna înfazê bû. Tevî xeteriya vîrûsa koronayê ya li girtîgehan girtiyên siyasî bi mirinê re rûbirû hatin hiştin û kujer, tecawizkar, diz û talanker hatin berdan. Bi vî awayî îşkenceyên li girtiyên siyasî didomin. TJA li dijî qanûna înfazê kampanyayek dabû destpêkirin. Helwesta jinan bi awayekî xurt li dijî vê yasayê derket.

**Jin axa xwe diparêzin**

Mijarek din a têkoşîna jinan jî dagirkeriya dewleta tirk bû. Ji destpêka salê ve bombe li ser Kurdistanê hatin barandin û gefên dagirkeriyê jî bi dawî nebûn. 24'ê tebaxê koordînasyona KJK'ê ragihand ku endama konseya rêveber a KJK'ê Leyla Agirî jiyana xwe ji dest daye. KJK'ê diyar kir ku ji nûnerên wêrek û leheng ên berxwedan û dîroka wan a azadiya jinê, hevala wan Leyla Agirî (Fîlîz Aslan) di hezîrana 2020'an de di êrîşeke hewayî de jiyana xwe ji dest daye. KJK'ê di heman daxuyaniyê de soza mezinkirina têkoşîna cangoriyên azadiyê dubare kir.

**Planên li ser Şingalê**

Ji hezîrana îsal ve dewleta tirk bi hemû hêzên xwe ve û bi hevkariya îxanetkarên Kurdistanê, hewl dide Kurdistanê dagir bike. Li dijî vê yekê şerê li Heftanînê bêsekin didome. Cenga li Heftanînê piştî êrîşên di 16'ê hezîrana 2020'an de geş bû. Dîsa planên dagirkirina Şingalê hene. Ji serê salê ve êrîşên li ser Şingalê didomin, herî dawî hikûmetên Bexda û Hewlerê bi planên xwe yên qirêj hewl dan warê ku beriya 6 salan jê bazdan, dagir bikin. Di hevpeymana di nav her du hikûmetan de tê gotin divê Şingal ji aliyê wan ve were birêvebirin. Şingaliyên ku piştî fermana 2014'an xwe bi xwe bi rê ve dibin, li dijî vê yekê nerazîbûn nîşan didin. Ew dibêjin em îxanetkaran li axa xwe naxwazin û divê Şingal ji aliyê şingaliyan ve were birêvebirin.

**Hedefgirtina jinên têkoşer**

Li dijî hemû gef û êrîşan di nav salê de, bi pêşengiya jinan çalakiyên ji bo yekitiyê hatin lidarxistin. Ji ber ku PDK'ê bi rêya medyayê jinên têkoşer hedef digire û heqaretê li pergala hevserokatiyê dike, jinên tevgera azadiyê bi taybetî bang li jinên başûrê Kurdistanê û di nav PDK'ê de kirin ku li dijî wan nêzikatiyên wan ên li dijî jinan xwedî helwest bin.

**Jin dê tola hemû êrîşan hilînin!**

Li aliyê din, 23'yê hezîrana îsal bi fermana Erdogan li warê berxwedanê Kobanê 3 jinên têkoşer hatin qetilkirin. Endama koordînasyona Kongraya Starê Zehra Berkel, Hebûn Mele Xelîl û dayika Emîne Weysî pêşengên civakê bûn. Dewleta tirk hewl dide yekitiya jinan ku ji bo wan xeteriya herî mezin e, ji hundir ve bêhêz bike. Bi vê windahiyê jinên rojavayê Kurdistanê di serî de diyar kirin ku ew ê têkoşîna xwe hîn mezintir bikin û xwîna wan jinên pêşeng, li erdê nehêlin.

25'ê Mijdarê di roja têkoşîna li hemberî tundiya li jinan tevî bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê li tevahiya cîhanê jin peyam dan. Çend ji navendên ku jin bi girseyî li wan kom bûn Amed, Stenbol, Moskov, Bangladeş, Guatemala, London, Berlîn, Hambûrg, Bern, Basel, Parîs, Lîmasol û Bruksel bûn. Bêguman ev tenê çend ji gelek navendan in, lê her çiqas mekan cuda bûn jî peyamên derketin pêş heman bûn. Jinan xwest kir ku tundiya li dijî jinan bi dawî bibe.

Berxwedana jinan weke stirî di nav çavên desthilatdaran de ye lê jin dibêjin bila çavên wan birijin.

## 100 sedem û 100 hezar îmze



Di heman demê de Tevgera Jinên Kurd a Ewropayê (TJK-E) îsal bi wesîleya 25'ê Mijdarê dest bi kampanyaya 'Ji bo darizandinda dîktator 100 sedem û 100 hezar îmze' kir. Kampanyaya jinan bi hemû leza xwe didome. Dema TJK-E'ê ev kampanya ragihand diyar kir ku gelek dîktatorên di dîrokê piştî mirin, hatin darizandin lê ew ê destûr nedin dîktatorê nû piştî mir were darizandin. Di çarçoveya kampanyayê de jin îmzeyan kom dikin û 100 sedeman nîşan dane ku dîktator were darizandin, lê bêguman ji 100 sedeman zêdetir sedem hene ji bo darizandina wî. Çalakiyên 25'ê Mijdarê ji vê rojê û şûn de jî 16 rojan kampanyaya li dijî tundiyê dewam kir ku jin li gelek deveran çalakiyan li dar xistin.



## Vîrûsa koronayê û tundî

Yek ji mijarên sereke yên jinan ên îsal, têkoşîna li dijî tundî û kuştina jinan bû ku di pêvajoya pandemiyê de zêde bûn.

Ji dawiya sala 2019'an û vir ve krîza vîrûsa koronayê bû belaya serê mirovahiyê. Weke di gelek mijaran de jî bi hatina şewbê careke din bi taybetî jiyana jinan serûbin bû. Tê zanîn ku mal ji bo jinan yek ji cihên herî xeter e. Ji ber qedexeyên derketinê êdî jin bi kujer û îşkencekarên xwe re li malê hatin hepiskirin. Li ser vê yekê saziyên jinan ji bo parastin û bihêzkirina jinan xetên telefonê sazkirin.

Li gorî hejmarên fermî yên Neteweyên Yekbûyî ji sedî 35 jinên tevahiya cîhanê di jiyana xwe de herî kêm carekê ji aliyê qaşo hevalê xwe ve tundî dîtin an jî hatin tacîzkirinn an tecawizkirin. Li tevahiya cîhanê ji sedî 38'ê jinan ji aliyê mêrê pê re yan jî hevjînên xwe ve tên kuştin. Ev reqem tenê ya fermî ye lê divê ne weke hejmarên rast werin nirxandin. Navên wan jinan, çîrokên wan, rûyên wan tenê di rojnameyan de derdikevin û her tim bi vî sernavî derdikevin: Trajediya malbatê û dramaya hasûdiyê. Dem hatiye ku em bêjin kuştina jinan femisîd e!



## Windakirina Gulistan Dokû

5'ê çileya îsal, xwendekara zanîngeha Mûnzûrê, Gulistan Dokû hat windakirin û heta roja me ya îro jî jin ji bo dîtina wê têdikoşin. Gulistan Dokû ji aliyê Zaynal Abarakov hat revandin ku zirbavê wî polîs e. Ev nêzî salekê ye, di serî de dê û xwişka Gulistan, jinên li Bakur û Tirkiyeyê ji bo dîtina Gulistanê têdikoşin. Di encama têkoşîna jinan de, herî dawî zirbavê sûcdar Zaynal Abarakov ji ber zexta civakê di vê dozê de ji erka xwe hat girtin, lê çalakiyên ji bo dîtina Gulistan û cezakirina sûcdaran didomin.



## Sê jinên berxwedêr

Di 9'ê çileyê de jî peyamên têkoşîna edaletê derketin pêş. Jina serbilind û şopdara rêya heqîqetê Sakîne Cansiz (Sara), têkoşera kurd û jina dîplomat Fîdan Dogan (Rojbîn), berxwedêra jiyana azad Leyla Şaylemez (Ronahî), di sala 2013'yan bi fermana Erdogan li orta Parîsê hatibûn qetilkirin. Sara, Rojbîn û Ronahî îsal jî bi girseyî, li gelek deveran hatin bîranîn. Di salvegera vê roja reş de ev 7 sal in di serî de jin bi hezaran kes dadikevin kolanan û xwestin kujer bên darizandin. Di nav salê de pêşketinên girîng ên di doza Parîsê de jî hatin qeydkirin lê heta ku ev doz bi encam nebe jinên kurd bi israr in ku li pey dozê bin.

# Salvegera Xwebûnê li me hemûyan pîroz be!

Sarya Denîz

Xwebûn têgeheke pir kûr û berfireh e. Mirov dikare bi awayekî gelemperî têgeha xwebûnê wiha pênase bike: Xwebûn fikir, raman, hişmendî, karakter, çand û exlaqekî resen ku di encama daneheveke dîrokî de pêk hatiye îfade dike. Bêguman ji ber ku mirov rihberekî civakî ye di rewşên asayî de her mirov li gorî taybetmendî û rastiya civaka xwe teşe digire, dibe xwedî karakter. Civak, bi çand, ziman, bawerî, hişmendî û şêweya jiyanê û hwd. ji hev du cuda dibin. Ji ber ku her ferdek jî endamê civakekê ye, ew ferd çiqas li gorî rastiya civaka xwe bibe xwedî karakter, mirov dikare bibêje ew qas xwebûna wî pêk hatiye. Kesek çiqas dîrok, çand, ziman, hişmendî, exlaq, bawerî û rastiya jiyana civaka xwe bizanibe û li gorî van rastiyan bijî ewqas "xwe" ye. Çiqas ji van dûr be ewqas ji "xwe" dûr e.

Mirov an jî civaka ji xwebûna xwe dûrketî dikeve bin bandora hişmendiyeke, hêzeke din. Yanî "xwebûn" ji holê radibe, tiştekî din pêk tê. Bêguman ev rewş jixwebe nabe. Ev rewş polîtîkayeke kûr û piralî ye, herî kêm xwedî dîrokeke 5-6 hezar salan e. Ev polîtîka polîtîkaya hêzên xwedî hişmendiya desthilatdar, dewletperest û zayendperest e. Armanca vê polîtîkayê kolekirin û mêtina gel û civakên cuda ye. Hêzên serdest û mijokdar kes û civakên ku wan ji xwebûna wan dûr dixe, wan dike kole û bi vî awayî li hemû destkeftî û dewlemendiyên wan dimije. Hêzên serdest û mijokdar ji bo vê rewşê pêk bînin bi hezaran sal in bi her cure rêbazên bêexlaq şerekî piralî dikin.

Têgeha ku herî baş rewşa dijberiya xwebûnê îfade dike têgeha "manqurtî"yê ye. Nivîskar Cengiz Aytmatov ê kirgiz di pirtûka xwe ya bi navê "Gun Olur Asra Bedel"ê de pêkanîna manqûrtiyê îfade dike. Li gor vê hêzên serdest dema dixwazin kesekî bikin manqûrt, serê wî rût dikin. Çermê deveyekî yê şil li serê wî girêdidin, dest û lingên wî girêdidin û wî bi rojan di bin tavê de dihêlin. Bi vî awayî her ku tav lêdixe ew çerm zuha dibe û diqurçime. Çerm li serî dişide û dibe sedem ku ew kes hiş û mêjiyê xwe ji dest bide. Bi vî awayî ew kes dibe kesekî bêhiş. Bêyî ku bifikire, lêpirsîn bike çi jê re tê gotin wê dike. Dibe koleyê xwediyê xwe. Xwedî û efendiyên wî çi bixwazin, çawa bixwazin ew wisa tevdigere. Yanî şert û mercên jiyana wî, fikirandina wî kar û barên ku bike, her tiştî, xwediyê wî diyar dike. Manqûrt êdî mirovê bi hevsar e û bêîrade ye.

Bêguman di roja me ya îroyîn de serdest ji bo ku manqûrtan biafirînin serî li vê rêbaza paşverû nadin. Rêbazên modern û nermtir bi kar tînin. Bi dehan sazî û amûrên xwe, kes û civakan di bin bombardimana bîrdoziyê de dihêlin. Çand, ziman, dîrok, bawerî, tarza jiyanê û hwd. yên civakan înkar dikin, tune dihesibînin. Dema di vê polîtîkayê de bi ser nekevin îcar vê carê jî wan nirxên ku civakekê dike civak, kesekî/ê dike kes reş dike biçûk dixe, paşverû nîşan dide. Di heman demê de çand ,ziman, dîrok, bawerî , wêje û hwd. ên xwe jî herî baş, pêşketî û dewlemend nîşan dide. Bi vî awayî ew kesên ku rastî van polîtîkayan tên li gorî asta serkeftina van polîtîkayan û li gorî asta berxwedana li hember van polîtîkayan dibin manqûrt an jî xwe ji manqûrtiyê diparêzin.

Îcar ku em werin rewşa me kurdan û xwebûnê; em dizanin ji sed salan zêdetir e ku polîtîkayên manqûrtkirinê li ser me tên meşandin. Di heman demê de ji bo ku em nebin manqûrt , xwebûna xwe biparêzin em jî li ber xwe didin. Wisa be em dikarin bibêjin îro li kesekî/e kurd ku çiqas dîrok, çand, ziman , bawerî, hişmendî , exlaqê kurdan, jiyana kurdewar bizanibe û li gor wan bijî, ewqas xwedî xwebûnê ye. Van nirxên hebûn û xwebûnê çiqas nizanibe ewqas manqûrt e, yanî kole ye! Rojnameya Xwebûnê jî îro li hemberî manqûrtiyê têdikoşe. Hewl dide rewşa manqûrtiyê ji holê rabike, tenê yek kurdekî/e manqûrt jî li holê nemîne. Em di vê rêya xwebûn û mirovbûnê de, ji hemû xebatkar û kedkarên xwebûnê re serkeftinê dixwazin. Salvegera weşana xwebûnê li me pîroz be û xwebûn êdî 2 salî ye. Xwebûn xwezanîn e, xwebûn xwenasîn e, xwebûn, xwebûn mirovbûn e.

# Girtî bi grevê dikevin sala nû

Navenda Nûçeyan

**Girtiyan li 130 girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê li dijî tecrîdkirina Ocalan greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger dan destpêkirin. Grev di hefteya 4'emîn de ye û girtî bi greva birçîbûnê sala nû pêşwazî dikin. Gelek girtiyan armanca grevê vegot**

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger ku girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê li dijî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, di 27'ê Mijdarê de dan destpêkirin, berdewam dike. Çalakiya ku ji aliyê komên nû ve tê domandin û di hefteya 4'emîn de ye.

Girtiyan, diyar kir ku sedema binpêkirina mafên li girtîgehan tecrîda li ser Ocalan e. Xizmên girtiyan jî anîn ziman ku daxwazên girtiyan daxwqazên wan in û bang kirin ku ji çalakiyên greva birçîbûnê re bibin deng. Serhat Karsû yê li Girtîgeha Tîpa L a Kalkandereya Rîzeyê dimîne, bi axaftina bi telefonê ya bi malbata xwe re, ragihand ku ew ê jî bikeve çalakiya greva birçîbûnê.

Erkan Tamîr ê piştî 3 salan beriya 2 mehan ji Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 4 a Şakrana Îzmîrê hatibû berdan jî diyar kir ku armanca çalakiya greva birçîbûnê ya bingehîn, şikandina tecrîdê û azadbûna Ocalan e. Tamîr xwest hemû kes piştgiriyê bidin çalakiya girtiyan.

Hevşaredara Dersimê Nûrhayat Altun a li Girtîgeha Tîpa F a Hejmar 1 a Kandiraya Kocaeliyê girtî ye, bi rêya telefonê ji malbata xwe re ragihand ku li dijî tecrîdê dest bi greva birçîbûnê kiriye.

**Ger daxwaz bi cih neyên...**

Girtî Sertaç Kiliçaslan ê li Girtîgeha Tîpa F a Kiriklarê dimîne û nêzî 15 sal in girtiye, diyar kir armanca çalakiya wan a greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger ji bo azadiya Ocalan e û wiha got: "Ger daxwazên me neyên qebûl kirin, çalakiya xwe veguherînin greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger."

Mehmet Kurt ê 49 salî ku li Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 2 ya Bunyan a Kayseriyê dimîne, di axaftina bi telefonê de ya ligel malbata xwe re, binpêkirinên mafan ên li girtîgehê ragihand. Kurt, diyar kir ku mafên wan ên mirovî hemû ji destê wan hatine girtin


Girtî Vedat Sevîm, Cengîz Oner û Mahmût Yamalak ên li Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 2 ya Bunyana Kayseriyê dimînin, weke koma 4'emîn çalakiya greva birçîbûnê didomînin.

**Komên nû tevlê dibin**

Li Girtîgeha Ereglî ya Konyayê 5 girtî beşdarî greva birçîbûnê ya li dijî tecrîdê bûn. Sutçu wiha got: "Em li girtîgehê 5 kes dimînin. Her hevalek me di komekê de cih digire. Piştî grevê sepanên kêfî yên girtîgehê zêde bûn. Rojnameyan nadin me." Navê girtiyên ketine greve wiha ne: Omer Sîpek, Îbrhaîm Sutçu, Muhammet Hasan Îbîş ê ji Efrînê û Faîk Budak.

Mûsa Sertkal û Fehmî Arslan ên li dijî tecrîda Îmraliyê dê bikevin greva birçîbûnê, diyar kirin ku tecrîd dijminê aştiyê ye û heke daxwazên wan neyên pejirandin dê çalakiya xwe veguherînin rojiya mirinê.

Kînyas Ataman ê li Girtîgeha Tîpa T a Bafraya Samsûnê girtî ye, bi telefonê ji malbata xwe re got ku bi Mehmet Yildirim re di greva birçîbûnê de ne. Ataman, destnîşan kir ku wê grevê dewrî Tekîn Çakmak û Halûk Ozek bikin.





# Rastiya dewleta tirk; zextên li dijî çapemeniyê

Li Tirkiyeyê zextên li dijî rojnamegeran didomin. Li gorî daneyan Tirkiye yek ji wan welatan e ku herî zêde zextê li rojnamegeran dike. Nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê (MA) Zeynep Dûrgût û Azad Kaya û nûçegihanên Jinnewsê Rojda Aydin û Derya Ren li Cizîrê hatin binçavkirin.

Rojnameger piştî şopandina nûçeyê dema ji Şirnexê ber bi Cizîrê ve dihatin, di têketina navçeyê de ji aliyên polîsan ve hatin binçavkirin. Polîsan, berê çekan dan erebeya ku rojnameger tê de bûn, pêşiya wê girt û nasnameyên rojnamegeran li GBT'ê xistin.

Rojnameger Azad Kaya, Rojda Aydin û Derya Ren piştî demekê serbest hatin berdan, lê ji ber ku der barê nûçegihana MA'yê Zeynep Dûrgût de lêpirsîneke ku Serdozgeriya Komarê ya Wanê dabû destpêkirin hebû hat binçavkirin. Hat diyarkirin ku nûçegihan Zeynep Dûrgût, di çarçoveya lêpirsîna Serdozgeriya Komarê ya Wanê de ku der barê nûçeya Osman Şiban û Servet Tûrgût ên ji helîkopterê hatibûn avêtin de hatiye binçavkirin. Polîsan destên Dûrgûtê ji paş ve kelemçe kirin û ew birin Midûriyeta Polîsan a Şirnexê. Hat ragihandin ku dê Dûrgût bibin Wanê.

Leşkerên dewleta tirk di operasyona 11'ê îlonê de li navçeya Şax a Wanê Osman Şiban û Servet Tûrgût binçavkiribûn û ew ji helîkopterê avêtibûn. Nûçegihanên MA'yê Adnan Bîlen, Cemîl Ûgûr nûçegihana Jinnewsê Şehrîban Abî û rojnameger Nazan Sala ji ber ku belgeyên ji helîkopterê avêtina Osman Şiban û Servet Tûrgût ê jiyana xwe ji dest da derxistin holê, hatin girtin. ***ŞIRNEX***

# Xwestina edaletê jî qedexe ye

Li navçeya Pirsûsê ya Rihayê beriya hilbijartina giştî ya 24'ê hezîrana 2018'an xizm û alîgirên parlamenterê AKP'ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz êrîşî kargeha malbata Şenyaşar kiribûn. Di êrîşê Hecî Esvet Şenyaşar û lawên wî Celal û Adil Şenyaşar hatibûn kuştin.

Emîne Şenyaşar a hevjînê xwe û du lawên xwe ji dest da, bi lawê xwe Ferît Şenyaşar re ku ji êrîşê bi birîndarî rizgar bûbû, du roj berê li daxwaza edaletê li ber avahiya AKP'ê ya Rihayê xwestin çalakiya rûniştinê li dar bixin. Polîsan Emîne Şenyaşar û lawê wê binçav kirin. Emîne Şenyaşar û kurê wî bi şertê kontrola edlî ango di mehê de du caran îmze bidin hatin berdan.

Emîne Şenyaşar a hat berdan destnîşan kir ku ew û lawê xwe Ferît bi armanca ku kurê wê Fadil Şenyaşar ê niha girtî tê darizandin, were berdan û edalet ji bo wî pêk were çalakiya rûniştinê li dar xistine û wiha got: "Ji kurê min re 150 sal ceza tê xwestin. Yek ji miqabil girtî ye û tê xwestin were berdan. Me li ber AKP'ê banga bêedaletiyê kir, lê me birin xistin nezaretxaneyê. Em dixwazin edalet pêk were. Zarokên min û hevjînê min li dikan û nexweşxaneyê kuştin. Em ji bo edaletê vê bûyerê çûn li ber AKP'ê rûniştin. Min xwest dîmenên li nexweşxaneyê derxin. Çima dîmenên li nexweşxaneyê vedişêrin? Qatilên malbata min li Pirsûsê pir bi rehetî digerin. Me edalet xwest lê wan zext li me kir. Kê zarokên min û hevjînê min kuştin? Yên ku malbata min qetilkirin kesek bû gelo? Zilmê li me dikin. Mifte li deriyê mala min xistin. Bila her tiştî derxin holê. Kurê min sê sal in di hepsê de ye. Ev edaleteke çawa ye? Dema zarokên min hatin kuştin li çepikan xistin. Êdî bes e bila lawê min berdin. Heke bernedin em jî kuştî ne."

Ferît Şenyaşar anî ziman ku wan li ber AKP'ê daxwaza edaletê kiriye û bi binçavkirinê bersiv dane vê daxwaza wan a rewa û demokratîk. ***RIHA***



## ZAROKÊN XWE MECBÛR BIKIN KU BI KURDÎ BIPEYIVIN

# Xwendina pêşîn divê kurdî be

Rizoyê Xerzî

*Mêvanê me yê vê hefteyê stêrkeke geş a esmanê ziman û wêjeya kurdî ye. Bi salan e di hemû jiyana xwe de kedeke mezin ji bo zimanê xwe daye û hê jî di kar û xebatên xwe de berdewame. Me vê carê ji bo xwînerên xwe bi mamoste û zimannas Reşo Zîlan re hevpeyvîn kir.*

**Mamoste Reşo Zîlan kengî û çawa dest bi nivîsandina kurdî kir?**


Cara yekem min di salên 1967-68'an de ku ez hingê ji bo xwendina bilind li Enqerê bûm. Li wir min hinek ciwanên kurd ên ku ne ji aliyê Serhedê bûn dîtin. Min dît ku di kurmanciya min û ya wan de hindek cudahî hene. Min dît ku hin tiştan em bi rengekî dibêjin ew bi rengekî dibêjin, an jî di devoka min de hin peyv hene ku li ba wan tune ne yan jî di devoka wan de hin tişt hene ku di ya min de tune ne. Ji bo nivîsandin û notkirina wan tiştan min dest pê kir nivîsand. Wekî mînak lîsteya gotinên ku min nebihîstibûn û hin gotinên pêşiyan min berhev kir. Wiha ez dikarim bêjim ku nivîsandina min a pêşî ew bû.

**Beriya demekê te li ser malperên civakî der barê pirtûka rastnivîsê ya tu bixwe jî tev li çend komxebatên wê bûbûyî got, "Ez tu caran nikarim navê xwe li bin tiştekî wiha binivîsim" gelo çima te wiha got?**

Belê rast e min ew hevok bi kar anî, lê çi bû sedem ku min nexwest navê min li ser wê pirtûkê were nivîsandin? Jihevtênegihiştinek hebû di navbera min û ew hevalên beşdar ên di wê civînê de. Bi fikra min ku ev prensîpek e ji bo min, kurmanciya nûjen a nivîsînê li ser devoka Cizîra Botan hatiye avakirin û ew jî ji Bedirxiyan dest pê dike. Bi taybetî bi riya Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr û bi van kovaran dest pê kiriye û hetanî salên heştêyî ev wiha berdewam bûye û hîç kêşeyek an jî pirsgirêkek nebû li ser vê prensîpê. Gava ku hindek hevalên me ji aliyê Amedê, Mêrdînê û wan derdoran hatin xwestin ku vê bingehê têk bidin û kurmanciya xwe ya deştê ya ji hindek aliyan ve têkel û pêkel ferz bikin, li ser zimanê me yê nivîsînê û hindek qayîdeyên ku Bedirxaniyan danîbûn. Wek mînak DE, RE û VE wekî DA, RA û VA nivîsandin. Tenê sedemek nîşan didan û digotin ev hema bêje di hemû devokan de wiha ye, lê ne wiha di gelek devokan de ew ne wiha ye. Heta di rojnameya pêşî ya Kurdistanê de ew wekî DE, RE Û VE ye. Rast e di klasîkên me de DA, RA, VA hatiye nivîsandin lê hûn jî dizanin ku klasîkên me li ser bingeha irûzê hatiye nivîsandin û di irûzê de gelek caran, RE û VE ji bo wezinê wekî DA, RA û VA nivîsandin ji bo ku wezin têk neçe. Vêca ew mirov dikare bêje ku ne bingehek e ji bo nivîsîna kurmancî ku îro em pê pexşanan dinivîsin. Rast e pexşana me ya pêşî derdora sala 1950'yî de hatiye nivîsandin lê piştî derketina rojnameya Kurdistanê ketiye nivîsarê.

Gava mirov temaşeyî klasîkên me dike, dibîne ku klasîk nivîsîna kurdan ji kîjan herêmê dibe bila bibe, hemû bi yek formê nivîsîne. Bo nimûne Pertew Begê Hekarî, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Şêx Nuredîn Birîvkanî, Şêxê Axtepî, Maçîn, Siyahpûş, Melayê Bateyî van hemû bi formekê nivîsiye û dema mirov afirandinên wan dixwîne mirov dibêje qey hemû ji heman deverê û heman gundî ne. Eva tiştekî seyr e lê mixabin piraniya kurdên me van tiştan nadin ber çavên xwe û fêm nakin. Ev sebebê ku divê kurmanciya me li ser vê bingehê pêşkeve û bê nivîsandinê. Berdixaniyan jî ev wekî qayîdeyek danîne û ji me xwestine ku em wiha binivîsin. Nimûneyekê bidim, cara pêşîn derdora 1525-1530'yî incîl wergerandine almanî. Yê ew incîl wergerandiye Martîn Luther e, bixwe ji herêma Nîtherzaksin e, devoka vê herêmê ji yên din gelekî cuda ye. Gelek caran heke yek ji wê herêmê biçûya Byrnê bi ihtîmaleke gelekî mezin wê gavê ji hev fam nedikirin, lê bi demê re ew dever niha ji hev fam dikin lê bêguman rewş beriya 500 salî ne wiha bû. Almanan ew ji xwe re kiriye bingeha zimanê nivîsînê ku jê re dibêjin almaniya bilind, heta niha jî ew bingeh nehatiye guhertin. Yekî ji devera Berlînê be, Hamburgê be, Beyrnê be, ji aliyê Nurinbergê be ev hemû, heta ji alî Swîsre û Awusturiyayê li ser vê bingehê zimanê xwe yê nivîsê dinvîsin, lê dîsa jî her kes serbest e li gor devoka xwe zimanê xwe yê axaftinê bi kar tîne.

Bo erebî, erebiya Bexdayê, ya Şamê, Tunusê, Libnanê ji hev cuda ne. Wekî nimûne erebekî ji Bexdayê ji erebekî Mûsilê fam nedikir, lê gava quran hat nivîsandin û hat weşandin û daket meydana bikaranînê hemû ereban zimanê wê zimanekî pîroz nas kirin ji ber ku ew peyvên xwedê bûn, dest pê kirin zimanê xwe yê nivîsandinê li gorî qayîde û qanûnên ku di quranê de hene nivîsandin û quran jî li gorî devoka qureyşiyan hatiye nivîsandin. Niha yekî qureyşî here Mexribê ez bawer nakim ji sedî 50 ji hev fam bikin, lê dema ku tu li deng û behsên resmî yên wî welatî guhdarî bikî yan jî yê welatekî din ê erebî guhdarî bikî, ger hinekî erebî zanibî tu yê jê fam bikî. Heçî kovar, rojname û pirtûk û tiştên wiha li zêdeyî 20 welatên erebî ev qayîde tên bikaranîn. Vêca çima em jî li ser vê bingehê kurdiya xwe ya nivîsînê pêşde nebin û bi kar neynin û wan bingehan nexin pratîka rastnivîsînê. Guhertina vê prensîpê gelek probleman derdixe pêşiya me. Ji aliyê etîkî ve, exlaqî ve ku em qedir û qîmeta pêşiyên xwe nagirin. Heyran hema bi kêmanî nivîsîna modern eva 130 sal in tê bikaranîn û klasîkên me eva qet nebe 500 sal in hatine nivîsandin û belav bûye. Niha em bêjin mewlûda kurmancî ya Melayê Bateyî li her deverên Kurdistanê û ciyê ku kurmanciaxêf lê dijîn tê xwendinê. Hindek mela derketine wan jî li gorî xwe, li gor kurmanciya xwe mewlûd nivîsîne lê bi qasî mewlûda Melayê Bateyî belav nebûye û rêz û hirmetek nedîtiye di nav kurdan de. Kêm zêde xelkê ku wê lê guhdarî dike jê fam dike, bingehên di wê mewlûdê de divê dakeve nivîsandina me jî divê em hirmetê bi van qayîde û qanûnên rastnivîsînê nîşan bidin.



Divê em hirmetê bi van qayîde û qanûnên rastnivîsînê nîşan bidin. 130 sal in kurmanciya modern hatiye nivîsandin û bi kêmanî divê em rê nedin ku rêyeke nû vebibe li pêşiya nivîsîn û belavbûna kurmancîyê

130 sal in kurmanciya modern hatiye nivîsandin, bi kêmanî divê em rê nedin ku rêyeke nû vebe li pêşiya nivîsîn û belavbûna kurmancî. Hingê zimanê me yê nivîsandinê dibe xwedî du forman, yek forma ku te bixwe texrîb kiriye û guhertiye û yek forma li ser bingeha klasîk pêş de diçe. Bi baweriya min ne tiştekî rast e û ez qet nikarim qebûl bikim ku wisa bibe.

**Ya rast ne tu tenê lê hinek zimannasên din jî û hinekên ku navên wan li ser pirtûkê heye jî dema nîqaşên li ser hin gotinên rêberê tên kirin, dibêjin; ev yek ne bi dilê me bû jî lê wiha nivîsandine, ev yek ji ber çi qewimiye?**

Ez nikarim li ser vê yekê zêde tiştekî bêjim. Helbet ew bîr û baweriya wan e lê ez tiştekî wiha şaş dibînim, di xebatên wiha de divê mirov xwedî prensîp be, bîr û baweriyên xwe û prensîpên xwe bi xurtî biparêze. Ne ku li hember hindekan an jî li hember fikreke ku ji aliyê piranîyê ve tê gotin bi zorê qebûl bike, na diviyabû qebûl nekirina û dikarin îro jî derkevin bêjin heyra di wextê xwe de me şaş kir.

**Li gorî te, ev nakokiya ku bi xwe re du şêweyên rastnivîsê aniye, çawa dikare çareser bibe?**

Rast e ev yek du şêweyên rastnivîsînê dide ber me ku eva sergêjiyeke mezin e. Li şûna rihetkirina rastnivîsînê em wê zehmetir dikin. Ji bo sererastkirinê li gorî min tenê riyek heye. Ew jî ev e ku mirov derkeve û bêje heyra me ev wiha kir, em gihîştin wê baweriyê ku ne rast bû. Em jî vê şaşiya xwe vedigerin û dîsa vegerin ser bingehên rastnivîsînê ya Bedirxaniyan. Helbet vêya jî bibêjin di awayê rastnivîsîna Berdirxaniyan de jî hindek tişt hene ku li gor zanista îro ne rast in. Divê em bizanibin ku Bedirxaniyan ev tişt li gor zanistên salên 1920-30 dane ber xwe û ji wir prensîp derxistine û ev qaîde danîne ji bo rastnivîsînê. Vêca sedsalek di ser re derbas bûye û di zanistê de gelek tişt hatine guhertin. Berî her tiştî zimanasiya wê serdemê û ya vê gavê, fonolojiya wê gavê û ya îro ji hev gelekî gelekî cudatir in. Ferqeke mezin ketiye navbera zanistên wê demê û yên îroyîn.

**Li gorî te çi dikare pêşiya bişaftinê bigire, herî zêde li bakurê Kurdistanê bişaftin bi pergal û berfireh berdewam e, divê kurd çi bikin, bi taybetî li Bakur?**


Mixabin asîmîlasyon daxa dil e. Di van 40-50 salên dawî de, li Kurdistana bakur û Tirkiyeyê kurmancî û her wiha zaravayê me yê zazakî jî pir bi xurtî dibişivin, asîmle dibe. Berî her tiştî ziman ji mezinan ji bo biçûkan mîras namîne. Yanî ji mezinan derbasî zarokan nabe. Ev yekser mirina zimanekî ye. Em zimanê xwe bi destê xwe dikujin. Divê em vê baş fam bikin. Erê bi awayekî sîstematîk asîmlekirina kurdan li dar e. Dewleta Tirkiyeyê ji roja roj ve, ji danîna cimhûriyetê û vir ve, ev yek daye ber xwe. Bo nimûne Ismet di nameya xwe ya rapora şerqê de dibêje: Eman di deverên kurdan de, yanî li Kurdistanê dibistan û medreseyan venekin. Eger ew bixwînin, wê pêş de herin, wê sibê bibin bela serê me. Ji ber ku xwendin di nav kurdên Bakur de belav nebû di wexta xwe de û zor û zordestiya li ser zimanê me, qedexekirina zimanê me, bû sedema herî girîng a helîna zimanê me, çi zazakî be çi kurmancî be. Tiştekî ku em bikaribin li hember vê prosesê bikin ew e ku heke em bi prensîp di malên xwe de bi kurdî bipeyvin. Zarokên xwe mecbûr bikin, ez dibêjim mecbûr bikin, ne ku bihêlin ew çawa dixwazin bila wiha bipeyvin, na.

Divê em mecbûr bikin ku ew bi kurdî bi me re bipeyvin û em bi wan re bi kurdî bipeyvin. Ew mezinên ku kurdî nizanin divê xwe hînî kurdî bikin. Yanî berî her tiştî di nav kurdan de mezin bûne û guhê wan fêrî kurdî bûye, pir bi rihetî dikaribin zimanê xwe hîn bibin. Ya herî giring jî xwendina zimanê kurdî ye, divê zimanê kurdî li Kurdistanê bibe zimanê resmî. Li zarokên kurdan bê mecbûrkirin ku ew pêngava pêşîn a xwendinê 4-5 salên xwendinê yên pêşîn divê bi kurdî be. Bi kurdî dest bi xwendinê bikin ne ku tirkî. Ev dikare rê ji me re veke ku em xwe fêrî kurdî bikin û divê zimanê kurdî dakeve bazarê. Divê kirîn û firotan, dan û standin tev bi kurdî bin. Dermanê neasîmlebûnê ew e ku heke tu li zimanê xwe xwedî derkevî û di pratîkê de li her ciyî bi kar bînî.

## Reşo Zîlan kî ye?



Zimannas û nivîskarê kurd di sala 1947'an de li Bazîda bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê. Di sala 1973'yan de koçî welatê Swêdê bûye û li wir bi cih bûye. Zîlan bi salan li gelek dibistan, xwendegeh û zanîngeha Uppsala ya Swêdê dersên mamostetiya zimanê kurdî dane. Her wiha li Enstîtutiya Kurdî ya Pardaxîsê, serokê beşa ziman û wêjeya kurdî ye.



Lokman Polat

# Evîna Bêcirekî

Ev romana duyem a Serkan Brûsk e ku ez dixwînim. Min der barê romana wî a bi navê "Sê Terîş" gotarek nirxandinê nivîsîbû û di pirtûka xwe ya bi navê "50 Romanên Kurdî" de weşandibû. Romana wî ya bi navê "Evîna Bêcirekî", weşanên "Lîs"ê li Amedê weşandiye. Roman 108 rûpel e.

Di destpêka romanê de birîndarekî evînê derd û kulên xwe, êşa xwe ya evînê rave dike. Lehengê romanê ku ev bixwe vebêjê romanê ye jî, di zaroktiya xwe de tiştên dîtine, bûyerên hatine serê wî, serencama dîmenên jiyana xwe ya biçûkahiyê û rewşa malbata xwe, karê qaçaxî yê bavê xwe, girtina xwe û xalê xwe, qala wan dike.

Bûyerên tên serê vê malbatê, lêdana leşker û polîsan, zilm û zordariya dewletê ya li ser gelê kurd di nav rûpelên romanê de baş hatine ravekirin. Jixwe tiştên ku tên serê malbatê hatine serê gelek malbatên kurd. Romannivîser baş kiriye ku serborî, serpêhatî û serencama malbateke kiriye mijara romanê.

Temaya romanê bi giranî der barê evîna platonîk de ye. Evînên platonîk ango evînên yekalî ji bo wê/wî evîndarî derd e, kul e, keder e, êş e. Evîndarên weha gelek êş dikişînin û derûniya wan xirab dibe, serobin dibe. Derdê êşa evîna platonîk dikişîne û ji qehran dikeve kuçe û kolanan rastî meyxwirekî tê û pê re dibe dost û bi hev re mey/şerab vedixwin. Der barê evîna platonîk de zilamê meyxwir van gotinên balkêş dibêje: "…şîreta min li te hîn ku tu ciwan î, heger evîn yekalî be, xwe ji ber bide alî, ji ber ku evîna yekalî mîna şerê li dijî dijminê nexuyayî ye, tenê mirov xwe birîndar dike. Heger du alî be, heta dawiyê bi egîdî li ber xwe bide. "




Di romanê de hinek peyvên tirkî hene, di şûna wan peyvan de peyvên kurdî bihatana karanîn hîn baştir bû. Wek mînak; peyvên mendîl, zengîn. Kurdiya wan; desmal û dewlemend e.

Xwendevan hetanî rûpela 32'an navê vebêj û her weha lehengê romanê nizane çi ye? Di rûpela 32'yan de diya wî dibêje, "Binêre Merdano" û mirov fêr dibe ku nav "Merdan" e. Vebêj û lehengê romanê Merdan gelek qala birayê xwe dike. Çawa ku polîs û leşker lêdidin, çawa ku derûniya wî xirab dibe, tirs lê peyda dibe. Hetanî rûpela 30'yî navê birayê wî çi ye nediyar e. Di rûpela 30'yî de diyar dibe ku navê wî "Rêzan" e.

Di gengeşe û minaqeşeya di navbera Merdan û bavê wî de, Merdan li hêzên çep, li kemalîstan rexneyên di cî de rexneyên biheq û rast pêşkêş dike, lê çi heyf ku ew jî bo çareseriya pirsa kurd hedefên şaş nîşan dide, çareseriyê di tirkên îslamîst ên sîyasî de dibîne. Ew dibêje ev pirs bi "birayên me yên tirk ên misilman,..biratiya îslamî wer çareser kirin." Tirkên îslamî jî kemalîstên bi rû ne û di pirsa çareserkirina neteweya kurd de ferqa wan û kemalîstan tune. Li Îranê 40 sal in ku îslamî û li Tirkiyeyê 20 sal in ku îslamîstên sîyasî li ser hikum in, desthilatdar in û di pirsa kurdan û Kurdistanê de tu çareseriyek pêk neanîne û tu tiştek hel nekirine. Îslamîst ji kemalîstan xedartir in, hovtirin, xwînxwartir in.

Merdan di nav cemaeta îslamîstên sîyasî de /ku ji wan re Fetocî tê gotin/ demekê dimîne û dibîne bê tirkên îslama sîyasî yên şoven, nijadperest û yobaz çiqasî li dijî kurdan in. Yek ji wan gotinên nebaş li dijî kurdan dibêje, Merdan li hember wî derdikeve pê re pev diçe, lê dixe û ew jî wî ji nav xwe diqewirînin, ji mala ku lê dimîne dikine derve, wî diavêjin kuçeyê. Merdan ji bo ku bi malbata xwe re pev çûbû û malê terk kiribû, ya rastî malbata wî ew ji malê qewirandibû, loma jî çûbû li cihê razanê yên cemaetê radiza, li wir dima. Piştî pevçûna wî û zilamê cemaatê, ew bi alîkariya dostekî xwe diçe li cem yekî ku navê wî Riza ye dimîne û li dikana wî dest bi kar dike. Riza zilamekî çepgir e, lê malbata wî faşîst û îslamî ye.

Merdan ji keça xalê xwe Periyê hez dike. Hezkirina wî, evîna wî evîneke platonîk e. Ew ji Periyê hez dike lê belê Perî jê re dibêje ku ew bi çavên biratiyê, bi çavên birayê xwe lê dinêre. Periyê lê bêbextî dike, derew lê dike, wî di bin tohmetê de dihêle û dibe sedem ku Merdan û diya xwe, malbata xwe bi hev bikevin û malbat wî ji malê diqewirîne. Loma jî ew neçar dimîne ku here li wargehên cemaeta Fetoyiyan razê. Helbet meyla wî ya îslamî jî heye û ew limêjê jî dike, lê di ruhê wî de hesta kurdîtiyê, ango kurdayetiyê jî heye.

Merdan vêca di mala Riza de dimîne. Riza zewicandî nîn e. Ew ji Merdan re behsa evîn û evîndara xwe dike. Li vir mirov evîndariyeke qedexe ku li gor edet, tore û tradîsyonên civakî gelek astengiyên dijwar li pêşiya wan hene, dibîne. Riza tirk e û sunî ye, keçik kurd e û elewî ye. Her du jî ji bajarê Çorumê ne. (Kurdên bajarê Çorumê bi tevahî elewî ne, lê çi heyf ku hinek ji wan xwe tirkmen dihesibînin û dibêjin em tirkmen in û ji Xoresanê hatine.) Keçik, navê wê Ebrû ye. Ew bi dîtin û ramanên xwe keçek komunîst e. Bavê Riza û malbata wî jî dîndar in, olperest in, mirovên wî faşîst in.

Di pirtûkê de wek bingeh du çîrokên du zilamên ku evîna wan têk çûye bi şêweya vegotineke çîrokî tê ravekirin. Yanî roman ji çîrokên her du zilaman (Merdan û Riza) pêk tê. Bi gelemperî ji pirtûkên weha re dibêjin kurteroman.

Riza serborî û serpêhatiya xwe ya biêş û kuştina evîndara xwe Ebrû ji alî mirovekî wî yê faşîst ve ji Merdan re qal dike. Evîna wî dibe qurbana nakokiyên siyasî û şer û pevçûnên di navbera çep û faşîstan de.

Merdan ji alî polîsên tirk ve tê girtin û bi saya Riza tê berdan. Riza bertîl dide polîsan û wî dide berdan. Merdan li ser pêşniyara Riza biryar dide ku bi keçxala xwe re biaxive û pirsgirêka xwe çareser bike. Merdan Periyê dibîne û Perî jê re qala hemû tiştan dike. Ew sedemên bêbextiya xwe yeko yek ji Merdan re rave dike, lê belê Perî nabêje ku ew bûye destgirtî.

Bi şev hevalekî Riza tê mala wan, Riza wî û Merdan bi hevûdu dide nasîn. Hevalê Riza ku navê wî Sîpan e, malbata Merdan dinase û ew dibêje ku dîlana birayê wî û keçxala wî heye. Malbatê ew vexwendiye dîlanê. Dema Merdan dibihîze ku evîndara wî Perî bi birayê wî re dizewice, ew şaş dibe û bêhnteng dibe ji malê derdikeve diçe derve.

Li derve çi tê serî, çi dike nediyar e, lê tiştê ku diyar e ew dimire. Çawa dimire? Gelo wî xwe kuşt?

Bi kurtî û wek gotina dawî; mijara romanê du evînên trajîk e û dil û kezeb li mirov dişewitîne. Dema mirov romanê dixwîne û diqedîne, dilê mirov bi Ebrû, Delal û Merdan dişewite.

Di romanê de ziman li gor jargona kesan û kesayetiyan, li gor tîp û lehengan hatiye bi kar anîn. Bi tevahî yan jî bi gelemperî zimanê romanê zimanekî serketî ye û herikbar e. Naveroka serborî û serpêhatiyên Merdan û Riza balkêş in, bi meraq in û mirov xwendina wê didomîne, dixwaze bizanibe ka encam çi ye, çawa ye, fêr bibe.

Dema ez romanek dixwînim naveroka wê bala min dikişîne û ez di dilê xwe de dibêjim xwezî ev roman li zimanê tirkî, îngilîzî, almanî bihata wergerandin. Ev kurteromana Serkan Brûsk xwezî li tirkî bihata wergerandin ku kurdên îslamîst ên di nav terîqet, cemaet û hêzên îslamî de ne, ji îslamîstên hov re xizmet dikin bila bixwînin û bibînin bê îslamîstên siyasî yên tirk çawa li dijî kurdan in!

# Quling û rovî

Sadiye Eser

Hebû tune bû, carekê ji caran quling û rovî destbirakên hev bûn. Ji ber rovî û quling destbirakên hev bûn rovî bang li quling kir. Rovî ji quling re got: Ez ê te vexwînim. Ez dê şîva te çêbikim.

**Quling got:** Temam.

Rovî çû hewdelek (dims) rohn çêkir û li ser tahtê rokir. Quling nikilê xwe li latê da, lê nikilê wî eşiya. Rovî jî ket ser tahtê (lat) û hewdel alast û hemû xwar.

**Quling got:** Tu li qimçika min ke rovî. Ev bû vexwendina te, dest û biratiya te.

Quling jî bang li rovî kir û got: Birayê rovî te ez vexwendim îcar dora min e. Em destbirakên hev in. Ez jî te vexwînim xwarinê.

**Rovî got:** Temam.

**Quling hêdîka çû kulmek nok anî û got:** Xwarina me nok in.

Nok li serê tahtê rokir û her yekî ji milekî ve dest bi xwarinê kir. Rovî ket pey nokan, lê her nokek bi aliyekî ve gindirîn û belav bûn. Heta rovî dihat noka din digindirî. Rovî westiya. Kir û nekir du nok zeft nekirin. Quling bi nikilê xwe ket ber nokan û hemû nok xwarin.

**Rovî ji quling re:** Bira wexta ku min hewdel çênekiribûya û li ser tahtê ronekiribûya, te jî nok li ser tahtê ronedikir. Ez jî li pey nokan nediwestiyam.

Her duyan got destbiraktiya me ji vir û şûn de nema bi kerî me tê. Em bi hev re xayin in. Her du ji hev belav bûn û destbiraktiya wan jî xelas bû. Roviyê ku hat xapandin çû xwe gihand cem hirçekî. Ji herç re got: Were ez û tu bibin destbirakên hev.

**Hirç got:** Bila baş e.

Rovî û hirç bûn destbirakên hev. Hêdika çûn. Heçî rovî ye, şeytan e. Xapiyaye.

**Rovî ji hirç re got:** Çi tahma dinyayê heye tev di vê çahlê de ye. Divê em bikevin vê derê. Em jê nexwin em ê çawa îdare bikin.

**Rovî ji hirç re got:** Tu dizanî çi ye? Ka ez ê dûvê xwe pê de berdim. Tu pêşî xwe berde çahlê. Ka rewşa wê çawa ye? Her du jî ji hev re xayin bûn.

**Rovî got:** Birayê hirç destbira, ez biçûk im tu mezin î. Ez ê dûvê xwe pê de berdim. Pêşî tu xwe berde. Ez jî dê xwe bavêjim ser milê te. Ez jî dê werim xwarê.

**Rovî aqilê hirç ji rê bir. Hirç berda çalê û pişt re got:** Birayê hirç bi xatirê te. Ez çûm. Bi xatirê te. Hirç çiqas bêje hey hawar hey filan jî kar nake. Rovî lêda û çû. Kir û nekir fêde nekir. Feqîrê hirç di wir de birçî bû ji neza.

**Rojekê rovî got:** Ez biçim serdana destbirakê hirç, ka halê wî halê çahlê çi ye?

Rovî çû ber çahlê. Hirç ji rovî re got: Xwedê teala tahma hemû tiştan aniye li vir daniye.

Halbûkî ji neza diçû û dihat. Tiştek di çahlê de nebû, ax dixwar. Rovî hingî çilek û binefs bû xwe negirt.

**Got:** Ka milê xwe bitewîne. ez ê xwe bavêjim ser mil te.

**Hirç got:** De bila. Rovî xwe avêt çahlê. Vêca hirç bi qirika wî girt.

**Hirç got:** Bi xwedê ez li vir bimirim tu yê jî li vir bimire. Em hevalên hev in. Te ez xapandim. Ev kar bû barê xapandinê. Te ez nexapandibûma, min jî tu nedixapandî.

Her du man di çahlê de. Birçî bûn. Bi vir de çûn, bi wir de çûn, çahl bû nikaribûn derbikevin. Gotin heyran em ji hev re sozekê bidin. Sozê berê qayîm bûn. Hirç got baweriya min bi te nayê. Te li min xayintî kiriye, tu zilamekî bêbextî, ez bi te bawer nabim. Em bimirin em ê bi hev re bimirin, em bimînin jî em ê bi hev re bimînin. Werhasil çi soz jê stand rovî çû ser milê hirç û got xirp xwe avet ser devê çahlê. Rovî ji hirç re gotibû wextê ez çûm ser devê çahlê ez e dûvê xwe berdim tu bi dûvê min xwe hilde banî, lê wexta rovî çû ser devê çahlê ji hirç re got: Hirç hirç welleh ez bêbext im.

Dibêjin soz û bextê filankesê xapê rovî ne. Rovî jî wisa xayin û bêbext e. Li hirç xayintî kir û çû. Hirç di wir de ma. Quling bi milekî ve çû hirç jî bi milekî ve çû.



***Çîroka Kerborana herêma Mêrdînê***

# Şer ne rêya çareseriyê ye

Piştî êrîşa hêzên PDK'ê ya li dijî gerîlayên PKK'ê, Wezîrê Pêşmergeyan Şoreş Îsmaîl diyar kir ku şerê her du aliyan xizmeta tu kesî nake

Ev demeke dirêj e ku hêzên taybet ên girêdayî PDK'ê li gelek cihên wekî Zînê Wertê, Garê, Rewanduz û gelek cihên din hêzên xwe yên leşkerî li herêmê bi cih dike. Di encama van bicihkirinan de, hêzên girêdayî PDK'ê şeva 13'yê kanûnê êrîşî wesayîtekê kiribûn ku hêzên gerîlayên PKK'ê tê de û di encamê de 3 gerîla birîndar bûbûn.



Gelê kurd, KNK (Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê), TEV-DEM (Tevgera Civaka Demokratîk), fermandarê giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mazlûm Ebdî û gelek siyasetmedrên ev bûyer rexne kirin û nerazîbûn nîşan dan. Der barê vê êrîşa hêzên PDK'ê de wezîrê pêşmergeyan Şoreş Îsmaîl jî daxuyaniyek nivîskî parve kir û diyar kir ku ev bûyer xizmeta tu aliyekî nake û divê pirsgirêk bi rêyên cuda werin çareserkirin. Îsmaîl di daxuyaniyê de destnîşan kir ku wan peyama xwe gihandiye her du aliyan û wiha got: "Hêvîdar im her du alî ders ji dîrokê bigirin. Divê were zanîn, ev bûyer ne di xizmeta wan de ye, ne jî xizmeta niha û siberoja herêma Kurdistanê dike. Ji bo wê divê hemû alî hewil bidin bi şêwazên cuda pirsgirêkan çareser bikin."

Îsmaîl di dewama axaftina de diyar kir ku wan di bûyera Sihêlayê de jî berpirsiyar agahdar kirine û pêşiya şerekî navxweyî girtine û da zanîn ku ew hêvî dikin dawî li hemû aloziyên di navbera hêzên kurdî were. ***SILÊMANÎ***

## 'Hêzên me êrîşî pêşmergeyan nekirine'

Piştî bûyera êrîşa hêzên PDK'ê ya li ser hêzên PKK'ê cigîrê Wezîrê Pêşmergeyan Serbest Lezgîn îdia kiribû ku YPG`ê jî li ser sînorê rojava û başûrê Kurdistanê êrîşî hêzên pêşmergeyan kiriye. Li ser vê mijarê Fermandariya Giştî ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan tu êrîş nebirine ser hêzên pêşmergeyan û ew rêzê li serweriya Başûr digirin û bang li serokatiya başûrê Kurdistanê kir ku dev ji siyaseta êrîşkarî û provokasyonan berde.

Fermandariya Giştî di daxuyaniyê de diyar kir ku di salên derbasbûyî de bi awayekî daîmî pêvajoyên hevrêziya hevbeş di navbera Rojava û Başûr de hebûn û berdewam dikin û wiha got: "Ev peywendî di çarçoveya şerê li dijî DAIŞ`ê û pêkanîna aramî û ewlehiya herêmê de dihatin kirin. Di encama vê hevrêziyê de gelek aloziyên ku li ser sînor rû didan, çareser dibûn."

Fermandariyê di berdewama daxuyaniyê de ev tişt got: "Hêzên me di 16`ê kanûnê de, li nêzî navçeya Sihêla êrîş bi ser tu baregehên pêşmergeyan de nebirine. Tu sedem tune ye ku êrîşeke wiha biqewime. Der barê mijarê de gelek daxuaniyên ragihandinê hatin dayîn ku rewşê mezin dikin û ji rastiyan dûr dixin. Di rastiyê de, tişta qewimî di encama peywendî û hevrêziya kêm a di navbera me û kes û saziyên peywendîdar ên başûrê Kurdistanê de bû."

Daxuyaniya fermandariyê wiha bi dawî bû: "Em weke Yekîneyên Parastina Gel rêzê li xweseriya başûrê Kurdistanê digirin û bang li wan dikin ku dev ji siyaseta êrîşkariyê, provakasyon û tawankeriyê berdin. Divê hemû pirsgirêk bi rêya danûstandin û diyalogê werin çareserkirin." ***QAMIŞLO***

# Peymaneke dijqanûnî

Piştî 6 salan di 9'ê Cotmehê de hikûmeta navendî ya Iraqê û hikûmeta başûrê Kurdistanê ku civaka êzidî di lepê DAIŞ'ê de hiştibûn û ji Şingalê vekişiyabûn û bûbûn sedema trajediyeke mezin, ji bo careke din vegerên Şingalê di navbera xwe de peyman danîn. Civaka êzidî li her derê li hember vê peymanê nerazîbûnên xwe tînin ziman, çalakiyan li dar dixin û her wiha vê peymanê jî wek 'Fermana 74'an' pênase dikin.

Der barê rewşa dawî de cîgirê Hevseroaktîya Meclisa Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Şingalê Hiso Îbrahîm axivî û diyar kir ku peymana di navbera Bexda û Hewlêrê de amadekirina fermaneke nû ye û ev ferman bi qanûnan tê pînekirin.

**Peyman dijqanûnî ye**

Îbrahîm helwesta xwe ya li dijî her du hikûmetan wiha anî ziman: "Ji roja destpêkê ve me peymana di navbera Iraq û PDK'ê de red kir. Ji ber ku vîna şêniyên Şingalê paşguh kirin. Ev peyman dijqanûnî ye. Ên ev peyman îmze kirine û di sala 2014'an de êrîşî Şingalê kirine wekhev in."

**Armanca sereke ya peymanê**

Hiso Îbrahîm bal kişand girîngiya rêxistinkirina civaka êzidî û derheqê armanca peymana Hewlêr-Bexdayê de û wiha domand: "Cara yekemîn civaka êzidî xwe birêxistin kir, pergala xwe ava kir, dest bi xwebirêvebirin û parastina hebûna xwe kir. Armanca sereke ji vê peymanê ew e ku nehêlin civaka êzidî xwe bi rê ve bibe û parastina xwe bike. Delîlê vê yekê jî ew e; piştî ewlehî û aramiya li Şingalê û vegera koçberên êzidî ev peyman pêk hat."

**Îdiayên bêbingeh**

Tê zanîn ku hikûmeta Iraqê û



PDK'ê armanca peymana xwe wek belavkirina ewlehî û aramiyê û vegera koçberên êzidî bi nav dikin. Hiso Îbrahîm der barê vê mijarê de jî ev tişt anî ziman: "Ev îdia bêbingeh in. Ji ber ku ewlehî û aramiya li Şingalê li Bexda û Hewlêrê tune ye. Têkildarî vegera koçberan jî ew behsa êzidiyan nakin, behsa kesên ku li nêzî Şingalê dimînin dikin û ew di êrîşa 2014'an a li ser Şingalê de piştgirî dabûn çeteyên DAIŞ'ê. Ew behsa kesên serên zarokên me jê kirin û jinên me firotin û niha li Hewlêrê di hembêza PDK'ê de dikin."

**'Bila êzidî bêdeng nemînin'**

Her wiha Îbrahîm got ku ji têkbirina kompoyên li ser Şingalê dê civaka êzidî bi rol û mîsyona xwe rabin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Divê hemû êzidî yên li Şingal û cîhanê li derdora vê rêveberiyê kom bibin û li hemberî kompoyên li dijî êzidiyan bêdeng nemînin. Li ser vê yekê em bang li hemû êzidiyên ku di bin banê PDK'ê de dixebitin dikin ku ji koletiyê xilas bibin û vegerin Êzidxanê û ji bo berjewendiyên civaka êzidî bixebitin. Her wiha em bang li gelê xwe yê başûrê Kurdistanê yên piştî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê destek dan me, dikin ku li dijî van polîtîkayan bisekinin. Em bang li gelê kurd ên çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê dikin ku li hemberî xeteriyan hêzên xwe bikin yek." ***ŞINGAL***



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Armanc têkbirina gelê kurd e

Di serdema serokwezîriya Mustafa Kazimî de, têkiliyên dewleta Iraq û Tirkiyeyê ji her demê baştir bûne. Di navbera her du dewletan de, her çiqas hin pirsgirêkên bingehîn hebin jî di mijara kurd û Kurdistanê de xwedî gotinek û helwestekê ne. Van her du dewletan bi salan Kurdistan di bin metingeriya xwe de girtine, ev dewlet niha jî planên nû dikin.

Piştî mudaxeleya hêzên navneteweyî, di pergala rêvebirina Iraqê de guhertin çêbû û başûrê Kurdistana wek herêmeke xweser a federe hat destnîşankirin. Li vê herêmê parlamentoya Kurdistanê ya di 4'ê hezîrana 1992'yan de hatibû avakirin, êdî bi statuyeke hîn berfirehtir bû xwedî însiyatîfa partî û hebûna siyasî ya li herêmê. Li vê herêmê ev statuya hat bidestxistin ji bo hemû kurdan bû cihê keyfxweşî û serfiraziyê.

Di nav her çar parçeyên Kurdistanê de gelê kurd cara yekem li başûrê Kurdistanê bû xwedî maf û nasname. Bi saya van mafên hatine bidestxistin ji parçeyên din ên Kurdistanê kurd û dostên wan berê xwe dan vê herêmê û xwestin di cih de vê kelecanê bijîn. Tevî her tiştî ev mafê hatî bidestxistin ji aliyê hemû kurdan ve hat parastin û xwedî lê hat derketin.

Tevî hemû hewildan û piştgiriyan jî li herêma Kurdistanê pergaleke demokratîk û wekhev nehate avakirin. Çend partî ango kes di van salên derbasbûyî de li gorî dilên xwe û li gorî berjewendiyên malbat û dostên xwe hewil dan ji xwe re derfet bi dest bixin.

Di van salên derbasbûyî de ji ber gelê Başûr ji şer û pevçûnan bêzar bûbû dengê xwe ji gendelî û neheqiyê re zêde dernedixist. Li gor wan gotinên kurd û kurdistanî nirxên herî mezin û biwate bûn. Lewma ji bo ev nirxên pîroz bi gotinên nexweş û xirab re neyê cem hev gelek tiştê di dilê xwe de jî nedigotin. Li gor wan pergala heyî xerab be jî ji ber ku kurdistanî ye baş e, lê zarokên wê demê niha mezin bûn û bûn ciwan. Pergala cîhanê guherî. Cîhan bi gelek aliyan ve bi pêş ket. Ev pêşketin di warê civakî de bi xwe re kaosek jî anî. Nerînên şexsan ango civakê êdî mîna berê biwate nayê dîtin û nirxê wê nîne. Di serdema pergala moderniteya kapîtalîst de sermaye her tiştî diyar dike. Asta "azadiya civakê" jî li gor xwe ew diyar dike. Ev pergala ku bi her awayî civak têk biriye û ber bi tinebûnê ve dibe, ji bo xwe li ser piya bigire her tiştî dike. Xwe bi rengê curbicur pêşkêşî civak ango pêşkêşî sermayedar û desthilatan dike. Kesên ji nirxê civak, çand û dîrokî dûr bikevin, ne mimkun e ku bikaribin xwe ji pençeyên vê pergala antî-civakê xelas bikin. Mînaka vê ya herî berbiçav jî li herêma Kurdistanê di kesayeta PDK'ê de jiyîn.

Li herêma Kurdistanê bi bedêla sed hezaran şehîd gelê kurd bû xwedî maf. Ev civaka resen a bi kevneşopiyên xwe û çanda xwe ve girêdayî, cara yekem li gor hebûna xwe ya dîrokî û çandî dijiya, lê di van salên derbasbûyî de pergala rêvebeiya herêmê ber bi olîgarşiyê ve çû. Pêşengiya vê jî PDK û Malbata Barzanî kir. Li gor wan hemû tiştên hatine avakirin di despêkê de yên wan in piştre yên gel. Biryarên li ser herêmê digirin jî wisa ne. Ger ev biryar ji bo wan baş be ji bo civakê jî baş e. Lewma di serî de ew li berjewendiyên xwe dinêrin, ger li gor berjewendiyên wan be erê dikin. Ji ber vê feraseta pûç û qels di van salên derbasbûyî de gelê kurd her êş û elem kişand. Van kesan her xwe li ser pişta civakê mezin kir û bi keda civakê xwe li ser piya hiştin.

Di van salên derbasbûyî de ji bo civakê tiştek nekirin. Gel dîsa di nav xizanî û bêderfetiyê de jiyana xwe domand. Ciwan bêperwerde man. Pergala perwerdeyê hîn a serdema rejîma Baasê ye ku ev bi temamî hebûna kurdan înkar dike. Di pergala tenduristiyê de pêşketin çênebû. Hin dewletên biyanî nexweşxane li herêmê vekirin lê ew jî ji bo kesên dewlemend ango kesên di ser civakê re xwe dibînin hatin vekirin. Dîsa gel bêderman û bêdiktor ma. Ji bo gel bikaribe debara xwe ya rojane bike bêderfet û bêemel hat hiştin. Kar nedît û bi her awayî muhtacî çend qurişê hikûmeta herêmê hat hiştin. Li herêmê kesên feqîr, feqîrtir bûn, kesên dewlemend dewlementir bûn. Di nav gel de cudahî çêbû. Berhemên xwemalî bêqîmet hatin hiştin û hemû pêdiviyên civakê ji derveyî herêm anîn. Ev hemû tişt PDK ango pergala PDK'ê daye avakirin li ser civakê ferz kir. Êdî ger gotin di cih de be civak fetisî.

Ji bo dubare PDK xwe safî bike, di 25'ê îlona sala 2017'an de referandum kir. Encama referandûma PDKê êşên gelê kurd mezintir û kurtir kir.

PDK'a ku nasnemeya binemala Barzanî ye, bi pergala ava kiriye ji bo gel û civakê tu tişt nekiriye. Hemû tiştê kirî jî ji bo xwe û dostên xwe kirine. Bêguman dewleta Iraqê û Tirkiyeyê jî vê dibînin û ji bo ev pergala kurmî birize çi ji destê wan tê dikin. Di gelek mijaran de jî gihîştin armanca xwe. Kerkûk ji dest çû, artêşa tirk xwe li Başûr bi cih kir.

Dewletên metinger, pergala ku dane avakirin dizanin çi ye û çawa bi rê ve diçe. Lewma jî bo herêma Başûr teslîm bigirin bi bêhnfirehî sekînin û her tim hewil dan ku piştgiriya biryarên şaş ên PDK'ê bikin, da ku şaşiyên hîn mezintir bike. Niha PDK bedelên van şaşî û kêmasiyên xwe dixwaze bixe stûyê gel.

Asta xirabiya PDK'ê kiriye gihaşt asta ku dewleta tirk û Iraqê dixwaze. Êdî li Başûr rêveberiya heyî bi tu awayî berjewendiyên gelê kurd di ser yên tirk û ereban re nagire. Dewletên metinger bi destê PDK'ê xwe li herêmê dîsa kirin xwedî îrade. Hêzên azadîxwaz jî hedefa van dewletan de ne. Ji bo ev dewlet di vê mijarê de jî bigihîjin armanca xwe dîsa karta PDK'ê bi kar tînin. Wisa diyar e ku PDK jî ji bo bi vê erkê rabe ji duh ve amade ye.

Di encamê de hevdîtina Erdogan û Kazimî ji bo kurdan wê çi bi xwe re bîne em ê bibînin, lê ew çi biryarê bidin jî di bingeha biryara wan de hevkariya PDK'ê heye. Ji ber ku ew jî baş dizanin, bêyî PDK'ê ne mimkun e ku bikaribin civaka kurd têk bibin. Lewma dixwazin tifaqê ji hindir ve têk bibin.

# 'Ev ne şerê kurdan e'

Hevserokê KNK'ê Ahmed Qeremûs ku ji bo pêşî li şerekî di navbera her du hêzên kurdî yên li başûrê Kurdistanê de bigirin dixebite, diyar kir ku ev şer ne yê kurdan, yê dagirkeran e û banga hişyariyê kir

Şandeya Kongreya Neteweyî a Kurdistanê (KNK) di 20'ê mijdarê de bi boneya aloziya di navbera hêzên kurd de, bi rêya diyalogê bê çareserkirin dest bi hevdîtinan kiribû. Şande, li başûrê Kurdistanê ji bo rê li  ber diyalogê vebike xebatên xwe didimîne. Hefteya borî şandeyê ji ber metirsiya şer a bang li her du aliyan kir ku berê xwe bidin diyalogê û bang li gerîla û peşmergeyan kiribûn ku 'xwe ji şer vegirin'



Endamê şandeya KNK'ê û hevserokê KNK'ê Ahmed Qeremûs têkildarî hewldanên KNK'ê yên ji bo pêşîlêgirtina şerê di navbera hêzên kurdî de axivî û diyar kir ku ev şer ne yê kurdan, ê dagirkeran e.

**Hewldan didomin**

Hevserokê KNK'ê Ehmed Qeremûs di axaftina xwe de da zanîn ku hewldanên wan ên ji bo pêşîlêgirtina şer û aloziyên li başûrê Kurdistanê didomin û wiha got: "Armanca me ji van hevdîtinan ew e ku em hemû aliyan ji metirsiya şerê kurd bi kurd agahdar bikin. Ev şer ne yê kurdan e, îradeyek ji derve vî şerî li ser me kurdan dide ferzkirin ku ew jî dagirker in. Di vê çarçoveyê de em bang li tevahiya civakê, partî û rêxistinan dikin ku li dijî derketina şer û metirsiya heyî helwestê nîşan bidin."

**'Komîteya ji kesên rûspî'**

Ehmed Qeremûs der barê hewldanên ji bo pêşîlêgirtina şer de diyar kir ku ew niha li gel Yekitiya Parlamenterên Herêma Kurdistanê di nav peywendiyan de ne û ev tişt anî ziman: "Di vî warî de kar û hewildanên me yên hevbeş hene. Pêngava me ya duyem jî dê amadekirina kongreyek berfireh a li ser asta serkirdayetiyê, hemû partî û rêxistin beşdar bibin, bê lidarxistin. Dê ev kongre ji bo çareseriya aloziyan û avakirina aştiyê be. Her wiha wê komîteyek ji kesên rûspî û kesayetên navdar ên nav civakê pêk bê û dê ev komîte bi şev û roj ji bo vê mijarê bixebitin."

**'Em ê zextan zêde bikin'**

Hevserokê KNK'ê der barê hewldanên KNK'ê de yên li derveyî welat ev agahî parve kirin: "Hewldanên me yên ji derveyî welat  bi rêya dîplomasiyê didomin. Bi rêya dost û siyasetmedaran em hewl didin zextê li ser PDK'ê bikin da ku bizanin bi vê helwesta heyî dê li ser asta navneteweyî zirarek mezin bide berjewendiyên kurdan."

**'Ger nebe…'**

Di dawiys axaftina xwe de Ehmed Qeremûs da zanîn ku ger hewldanên wan bi ser nekevin û guh nedin wan, ew ê neçar bimînin li hemberî aliyê şer li ser kurdan ferz bikin helwestê nîşan bidin û li hemberî wan daxuyaniyên cudatir bidin.

Sersala we

pîroz be!

Bi hêviya ku em êdî nebêjin sal bi sal xwezî bi par û sala 2021'ê bibe sala bidawînanîna li hesret û kedera dilên dayikan. Bibe sala azadî, xweşiyê û aştiyeke bi rûmet bi xwe re bîne. Bi van hestan em sersala gelê xwe û hemû gelên cîhanê pîroz dikin.

MEBYA - DER

Komeleya Yekitî û Çandê ya Piştevanî û Alîkariya bi Malbatên Xizmên Xwe Li Dergûşa Şaristaniyan Wenda Kirine



Destar

## Qeyrana hevalcêwî: Şer û aborî

Ehmed Pelda

Çîroka şaristaniyê ji heleke din ve dîroka şer e. Divê bê pirsîn ku gelo bi saya şer mîrovahî bi pêşket? An jî çima şer diqewimin? Ma şer hergav neyînî ye? Gelo li dewsa ew rê û dirbên şer neçar dikin, tiştekî din jî mimkun e?

Belê rêzkirina pirsên cuda jî pêwîst e, lê ya pêwîst beşa bersivan e. Dev ji dehan pirsan berdin, tenê ji bo pirsekê bi sedan, bi hezaran bersiv mimkun e. Jixwe, heke her beşa zanistê li gor dîtin, têgîn û rêbaza xwe bersivê bigere, ji niha ve jî 3 hezarî zêdetir bersiv amade ne.

Rawernas dikarin bibêjin mirovahî ji hevxwarina heywanan bi riya çavdêriyê hînbûn e ku şer hin tiştan diguherîne. Dîsa, bi nêçîrvaniyê hînî kuştinê bûne û piştre jî ev wek rêyeke çareseriyê li hember hev bi kar anîne. Derûnnas dikarin bibêjin, kesê ku hestên wek dexesî, çavnebarî, tirs, xof, bertekên xweparastinê, xwenegirtinê, berzbûna adrenalînê, an jî berevajî wê azwerî, daxwaziya serdestiyê bi riya zordestiyê û şer pêk tînin. Civaknas dikarin bi reng û rûçikê cuda yên şênî, nakokiyên li ser bawermendiyê, cudatiyên navbeyna çînan, cureyên beşên gel ên wek jin, mêr, zarok, kalûpîr, ciwan hwd... bînin ziman.

Ji ber girîngî û beranberiya mezinbûna kêşe û pirsgirekê nêzîkdayînên sîyasî û aborî wek mijarên sereke tên dîtin. Serweran şer an jî çareseriya tengasiyan bi destê kiryarên aborî û sîyasî kirin.

Aborînas destnîşan dikin ku piştî her qeyraneke aboriyê şerek pêk tê. Ji ber ku parvekirina çavkaniyên xav, hebûnên sererd û binerdê û berhemên çêkirî, rê û dirbên stratejîk ên digihêjin herêmên dewlemend û hwd. dibin sebebên dijhevderketinê. Wext tê ku êdî bi danişîn, danûstandin û nîqaşan çaserî pêk nayê û beşeke perçeyê mijarê bi behaneyekê êrîşî dijberê xwe dike. Dixwaze desteseriya dewlemendan bike, lewma heke derfetan bibînin li ser hêzên aboriyê de digirin û talanan radikin. Gava bersiv jî hebe êdî şer giran dibin.

Rastî û peyitandina van pêşdîtinan him herêmî û him cîhanî heye. Wekî şerê navbera eşîran ên şêlandin û rakirina talanan, an jî şerê du dewletên hevsînor mînakên berbiçav in. Dîsa di asta navneteweyî de berî şerê cîhanê yê yekemîn tê xuyanê ku qeyrana aboriyê dest pê kiriye û her diçe kûr dibe. Bi taybetî qeyrana ku di sala 1880'yan de rû da, demeke dirêj berdewam kir. Gavên ji bo çareseriyê hatin avêtên nebûn derman. Xêncî pêçandina êşên rojane yên peydakirina derfetên der barê, ji binî ve cebirandinekê pêk nehat û tengasî vegeriyan pevçûnan, pevçûnan alav girt bûn şer, şer bû şerê cîhanê. Ji ber vê welat wêran bûn, hin dewlet xerabûn, hinekên wan jî ji holê rabûn û serweriya aborî û siyasî ya cîhanê jî ji binî ve guherî. Ji hêlekê ve Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), ji hêla din ve bi destê şoreşa sosyalîstan Yekitiya Sovyetan pêk hat. Dewletên li seranserê cîhanê serdestî dikirin, yên wek Îngilîstan, Fransa û Almanya yan derbe xwarin an jî wêran bûn. Împaratoriyên qelsbûyî yên wek Osmaniyan jî ji binî ve ji holê rabûn.

Lê belê nebû. Têrê nedikir. Serobiniya encama şerê cîhanê riya aştî, aramî û pergalsaziyeke nû venekir, lê DYA'yê nikaribû barê şerê cîhanê hilgire. Berdêla destekariya hevpeymanan a serbazî, aborî û sazûmaniyê ji hêla aboriya navxweyî ve bû barekî giran. Qeyrana di sala 1929'an de dest pê kir tenê li vî welatî nema. Encamên wê ji Ewropayê heyanî Çîn û Japonyayê jî xuya bûn.

Riya çareseriya qeyrana aborî, sîyasî û civakî bi mildayîna nijadperestiyê ve rengê xwe da der. Her çiqas Îtalyaya Mussolînî, Almanyaya Hîtler wek kiryar û sembola vê pêvajoyê tên xuyanê jî sîyaseta nijadperest, aboriya neteweyî li hemû deverên cîhanê ruyê xwe da der. Japonya, Çîn, Tirkiye, welatên Amerîkaya Latîn jî li welatê xwe di bin banê rêberiya faşîstan de bûn yek û wekî yek netewe, yek nijad xwestin rê û çareyan bibînin. Vê jî bê mihnet derê şerê cîhanê yê duyem vekir.

Di encamê de ji ber şer 60 milyon mirov jiyana xwe ji dest dan. Ji 100 milyonî zêdetir ji şêniyên welatan bûn penaber û bi mecbûrî axa xwe terikandin.

Ji bo temîjîna bûyera pêkhatî, an jî hewildanên pêşîlêgirtina şeran, wêraniya welatan, bîreweriyên cudaxwaz û faşîst gelek sazî û destgehên navneteweyî hatin avakirin. Dîsa pergala yasayan, sazûmaniya siyaset, dewlet û aboriyê ji nû ve hat serastkirin, lê têrê nekir. Pêlên qeyrana aborî her diçû gur dibû. Pêşbazî û hevrikiya aborî jî giran dibû. Parvekirina hêz û kan û berheman bi eniya dewleta Çînê ya sosyalîst an jî Sovyet û welatên bin tunê wan re ne dihate ecibandin. Şerê li dijî Vîetnamê daxwaza vekirina eniya şer a li dorpêçkirina hêza sosyalîst bû. Qeyrana bazirganiya navneteweyî ya berhemên xav û çêkirî riya vî şerî vekir, lê encamên şer qeyran kûr kir. Bihayê petrolê giran bû, bihayê maliyeta hilberîna pîşesaziyê zêde bû ku radeya qeyranê gur kir. Pergala derbeyên leşkerî hat tertîpkirin.

Hevrikiya DYA û Sovyetê piştî têkçûna Sovyetê kete merheleyeke nû.

Ev merhele îro li ser axa me rû dide. Li ser rûyê erdê şerê herêmî dixuyin. Rêxistin, dewletên herêmî û hêzên wan tên xuyanê, lê di ser wan re jî hêzên mezin hene ku her tişt di bin çavdêriya wan de yan jî hin caran bi mudaxeleya wan bi rê ve diçe. Êdî qiriza aborî û ya sîyasî û leşkerî serbiser dimeşe.

# 'Bi me serbilind bin'



Hisên Çatikkaş

5 sal berê dewleta tirk li Cizîra Botan qedexeya derketina derve ragihand û di qedexeya ewil de ya 9 rojan dewam kir, 21 kes şehîd bûn. Di nav van kesan de pitikeke 3 mehî û Cemileya 10 salî ya termê wê di sarinca malê de hat veşartin jî hebûn. Tevî van jî dewletê hemû kesên ku jiyana xwe dest dan weke "terorîst" îlan kirin. Ji bilî van jî li Cizîrê berxwedaneke mezin a gel hebû. Gel 9 rojan li ber xwe da û nehişt ku dewlet bikeve taxên Cizîrê. Dewlet tevî hemû êrîşên xwe yên hovane jî li hemberî berxwedana gel bi ser neket û têk çû. Di van rojan de çi qewimî?

Rast e, qedexeya derve hatibû îlankirin lê belê di pêşengiya dayikan de ev hatibû redkirin û ji gir û hûran ve her kes li ber deriyên malên xwe û li kolanên xwe xwedî derketibûn da ku dagirker nikaribin bikevin malên wan. Şev li ber agirên ku kolanan vêdixistin li hemberî tang û topên dagirkeran tilîlî didan. Roj jî li taxên xwe pirs û pirsiyariya hev dikirin. Di van 9 rojan de tilîliyên dayikan tang û topên dagirkeran têkbir bûn. Piştî têkçûna dagirkeran qedexeya ku bi fermî hatibû ragihandin lê cizîriyan ev red kiribûn, bi awayê fermî dîsa hatibû rakirin, lê kujeran 21 kes ji cizîriyan qetil kiribûn. Cizîriyan jî bi merasîmeke 100 hezar kesî zêdetir, ew 21 kes oxir kirin.

Piştî van rojan gelek caran qedexeyên rojane hatin îlankirin, lê belê dîsa cizîriyan li ber dagirkeran serî netewand. Her û her li ber xwe dan. Di dema qedexeya dawî ya 14'ê kanûna 2015'an hat îlankirin û hetanî 2'yê adara 2016'an domiya, zêdetirî 288 kes hatin kuştin. Gelek ji van kesan di jêrzemînan de ji aliyê dewletê ve bi saxî hatin şewitandin. Bi heman awayî di nav van kesan de ji zarokê 5 salî heta kalên 80 salî, xwendekar, rojnamevan û siyasetmedar hebûn. Dewleta ku di qedexeyên ewil de têk çûbû, vê carê bi tevdîr tevgeriya û memûr û mamosteyên xwe beriya qedexeyê ji Cizîrê vekişandin. Bi vekişandina memûr û mamosteyên xwe, bi heman awayî dagirkeriya xwe jî îlan kiribû. Bi vê dixwest gel bitirsîne û bajêr vala bike. Tevî vê jî gel bi berxwedana xwe bawer bû, lewma jî malê xwe bernedan ango li gorî dagirkeran tevnegeriyan û Cizîr vala nekirin. Cizîriyan digot "berxwedan jiyan e" û dewletê dît ku cizîrî, Cizîrê bernadin. Bi tang û topên xwe yên li ser girên Cizîrê bi cih kiribûn, dest bi êrîşên hovane kir. Destpêkê bi sedan guleyên tang, top û çekên şexsî li Cizîrê barandin, bi gotina dayikeke cizîrî "weke teyrokê gule li Cizîrê dibariyan". Dîsa zilamekî ji Cizîrê wê demê gotibû "min hijmart li ser hev 64 top avêtin". Mehmet Tunçê yek ji pêşengên berxwedana Cizîrê bû, di axaftineke xwe ya piştî qedexeya 9 rojan wiha gotibû: "Dewlet êdî nabêje ew AKP'î ye, ew HDP'î ye, ew PKK'î ye, hema ku kurd be, qetil dike." Di vê qedexeya dawî de jî dewletê eynî wisa kiribû û heta ji vê zêdetir jî kir. Kî û çi ket ber (zarok, jin, kalepîr, çûk, kevok, ajalên din...) texsîr nekir û da ber guleyên tang û topên xwe. Dewletê jixwe di serî de tevdîra xwe girtibû û karmendên xwe ji bajêr vekişandibûn, lewra yên mayî hemû ji bo dewletê "ne tu tişt, ne tu kes" bûn. Li gorî wan hemû tişt û kesên li Cizîrê mayî "terorîst" bûn. Belê li gorî wan kal û pîr, pitik û zarok, çûk û teyrik, dar û ber, mal û milkên li Cizîrê "terorîst" bûn. Bi vî hişê êrîş kir. Lewma kevokên li ser banan serê wan jêkiribûn; lewma mirîşk bi pirtikên wan ve xistibûn sarincan; lewma çêlek bi sedan guleyan kuştibûn; lewma pirtûk yeko yeko qetandibûn û agir berdabûn wan; lewma mirov bi benzînê şewitandin...

Bi hevokan em nikarin qala hovîtiya wan bikin. Lewma jî li vir çi were nivîsandin wê kêm bimîne, lê belê berxwedana cizîriyan li hemberî hovan bi ser ket, îspata vê jî ew e ku cizîriyan li hemberî hovan serî netewand.

Çanda berxwedêr a Cizîrê xwe digihîne bi sedan salan. Ji ber vê yekê rihê Cizîrê li her derê li hemberî hovan têdikoşe. Belê rast e, di vî bajarî re şerek derbas bû lê berxwadan hê li vir e!

Cizîrê li hemberî hemû hovîtiyan 79 rojan li ber xwe da û serî netewand, lê mixabin dagirkeran dor lê girtibûn û çûnûhatina bajêr jî nebû. Lewma xwarin û vexwarin qediyabû. Ji bo berxwedêran jî ti alîkarî nebû û lojîstika van jî qediyabû. Tevî van jî teslîmbûn di ferhenga berxwedanan de nebû. Hinek berxwedêran guleya xwe ya dawî ji bo xwe bi kar anîn. Hinekan jî heta dawiyê li ber xwe da û jiyana xwe ji dest dan. Yên herî dawî jî bi telefonan xwe gihandin, televîzyonan û gotin: "Bi me serbilind bin". Ji ber ku wan wehşeta dagirkeran bi çavên xwe dîtibû û ew jiyabûn. Li hemberî wehşeta sedsala 21'ê a dagirkeran vîna mirov li ber xwe dabû û hê jî li ber xwe dide li Cizîrê!

Ciwanên ji behra azadiyê çend kêlî bi canê xwe dizîbûn, li Cizîrê bi serbilindî li ber xwe dan û ji nav me bar kirin. Teslîm nebûn, têk neçûn û nehiştin dagirker bi rehetî bikevin nav axa Cizîrê. Dagirkerî bi tang, top, teyare, çek û cebilxaneyên sedsala 21'ê li hemberî vîna mirov a berxwedêr, li Cizîrê têk çûbû. Lewma bi çavsorî êrîşî jin, zarok, kalepîr, ajal, dar, mal û milkê cizîriyan kiribûn. Çi ket ber wan texsîr nekirin, dan ber tang û topan. Mirovên ku ji malê xwe derneketin bi saxî girtin û ew înfaz kirin. Birîndarên li jêrzemînan mayî bi saxî hatin şewitandin. Malên Cizîriyan ji aliyê dagirkeran ve hatin talankirin û li wesayitan bar kirin weke malên mîrate ji aliyê mirovên rûgemarî û maskekirî ve ji xwe re birin.

Li malên Cizîriyan nivîsên dermirovî hatin nivîsîn. Çanda dagirkeran a talanker careke din li Cizîrê derketibû holê. Tevî van hemûyan jî Cizîr têk neçû, piştî bidawîbûna qedexeyê cizîriyan li aliyekî şîna xwe digirtin, li aliyê din jî malên xwe biserûber dikirin. Bi awayekî kolektîf alîkariya hev dikirin, êş û şînên hev parve dikirin. Weke ku ji dagirkeran re bêjin hûn çi bikin jî em li vir in. Weke ku daxwaza berxwedêran bînin cih, bi wan serbilind bûn.



# Sersala we pîroz be!

Sala nû bi hêvî û daxwazên nû dest pê dike; ji bo bindestan azadî, ji bo civakan aştî û aramî û ji bo jinan jiyana wekhev... Bi hêvî û daxwazên azadî, aştî û wekheviyê, sala 2021'ê li gelê me û hemû gelên cîhanê pîroz be.

Dayikên Aştiyê

# Dêrsim û Asîmîlasyon

Qomê Dêrsimi dustê pêro zorvajiyan de hem îtîqatê xo, hem kî zonê xo heta roza ewroyîne ard. Dewlete serva ke Dêrsim bicêro binê bandora xo, ameyena şarî, doman û gencan hedef cêna

Meral Ozel

Dêrsim, riyê kamayis û îtîqatê xo ra her waxt binê serdestan der a. Dêrsim de kirmanckî û kurmanckî yenê qiseykerdene. Hama hama sûke de kurdî weşiye kenê. Her waxt gorê raştiya şarî xoseriya xo esta. Bi se-serran o ke na kamiya şarî binê zilm û zorvajiye der a. Terteleyan ra heta surgin, kistene, vesnayena dewan bara xo pêro xiravîyan ra gureto. Onca kî dewlete tol nêvindena.

Qomê Dêrsimi dustê pêro zorvajiyan de hem îtîqatê xo, hem kî zonê xo heta roza ewroyîne ard. En jêde kî na bara pîlan, bara kokimanê Dêrsim bî. Nika roza ewroyîne, na se-serra 21'yîne de niyadîme. Dewlete serva ke Dêrsim bicêro binê bandora xo, ameyena şarî, doman û gencan hedef cêna. Coka honde mektevê cemaatan sûke de ameyî rakerdene. Zanîngeha ke hetê akademî ra teway rê nêbana werte Dêrsim de rakerde. Polîtîkaya asîmîlasyonêde pîl yena raye ra berdene. Her ca de, her gucik de nê gurekarî polîtîkaya asîmîlasyonî vejîne virnîya gencan, domanan û şarî.

**Çimeyanê Munzurî**

Mektevan ra heta zanîngehî, heta esnafan onca dugelanê teberî ra wendekarî ardî serva na polîtîkayanê asîmîlasyonî. Her hetî ra rûmetanî qomî hedef cênê, coka jiyara Çimeyanê Munzurî verê çiman de kerde bêxêr. Meste bêre kes hûrmet na jiyare rê nêmisneno, çileyî nêrê panayenê. Polîtîkaya asîmîlasyonî Osmaniyan ra heta se-serranê verênan yê Komara Tirkiya û heta serra 2020 bêmaven dewam kerd. Pêro îmkanê dewletî serva na polîtîka yenê karardene.

**Dêrsim de cemaatî vejiyayî**

Her waxt rayanê ciya ciyayan dewlete na polîtîka de israr kerd, kamayisê Dêrsim nasnêkerd. Tertele ra dima mektevan de domanê Dêrsimi ardê pêser. Dest ra çîy ke ameyî kerdî. Nê domanî ke gorê xo kerdî pîl, peyser rûsnayî zerrê qomî. Onca kî bese nêkerd ke Dêrsim bikerî Tirk û Sunnî. 12'ê îlona piya ke Dêrsim de domanî bi zora çeyan ra cêriyayî. Na reye berdî mektevanê asîmîlasyonî yê Îmam Hatîban. Bi desan dewanê Dêrsim de camiyî ameyî virastene. Serranê 1990 ra dima kî cemaatî vejiyayî werte. Serva ke îtîqatê Raya Haqî biqednî, onca hedef de en jêde domanî estbî. Namê nî cemaatan vurînî hama pêro kî serva eynî zîhniyet gurenê. Seweta jû armanç Dêrsim kerd hedefa xo. Elewîye qedinayis karê sifte yê nê cemaatan o.

En peynîye de rayêda bîne vejîyaye werte ke bi raya tarîkat û cemaatan Elewîyîya Dêrsim hedef der a. Pêro bi rêxistin biyayena gurenê. Zerrê Dêrsim de her gucik, her qeza û dewe de temsîlkarê nê asîmîlekerdoxan vejînê werte.

Jû armanca nê polîtîkayan esta. Dewleta ke teyna jû ziwan, jû olî ser o ameya ronayene, gorê raştiya a dewlete her kes Tirk kerdene, îtîqatê înan vurnayen a. Dêrsim kî serva dewlete her waxt biyo derd.



**Demografî yena vûrnayene**

Dêrsim de honde esnafî ke teber ra amey sûke, kam î? Çinay rê na sûka kî tey zaf kar çîn o, raya na sûke gureto. Zanîme wendekarî ke serva ameyenêda rinde emeg danê, gurenê ke şêrî zanîngehe, biwanî. Jû wendekar çinay rê teber ra, jû dûgelêdo bîn ra sono Dêrsim. Na sûke de çik esto ke bi desan wendekarî

Afganîstan, Sûriye, Tirkmenîstan, Somalîyî ra bêrê Dêrsim de biwanî. Ya kî armanca dewlete bi ardena nê wendekaran çik a? Nê wendekarî Dêrsim de kî ca bî, demografiya sûke ke asan yena vûrnayene. Nufûsê sûke nika ra vurîya. Dewleta ke poşta nê kesan der a, înan rê raya her çî rakena. Dêrsim vanê, hama na polîtîkaya asîmlasyonî pêro hereme de bi rayanê cîya cîya yena ramitene. Taybet ke doman, genc û cenîyî hedefê nê kesan der ê.

Kokime ke dûste pêro tengiyan de na kamayis û îtîqat rê wayir vejiyayî înan rê deyn o ke naye ra tepiya ke no ziwan û îtîqat, na kamayis biciwîya.

# Wa 2021 ma bimbarek bikero

Valêre

Nê rojan de ma serra 2020î xo dima verdenê û umud kenê ke serra 2021 û serranê bînî semedê pêroyê dinya û milletanê cîya-cîyayan nêbo sey serra 2020î. 2020î xirab ame û nika ma yenê rojanê peynî yê serra 2020î la reyna zî bobelat, nêweşî û xirabî peynîya şaranê dinya nêverdenê. Ma tay çîyan bîyarê xo vîr û semedo ke nê çîyî êdî biqedîyê û dewam nêkerê çi destê ma ra bêro ma bikerê.

Qezaya Sarayî ya Wanî de 4ê sibate vewrês ginabi mînîbusêk û wesayîtêkê karîser. Hedîse de 5 kesî merdbi, 6 kesî birîndar bibî û 2 kesî zî binê vewre de mendbi. 5ê sibate de wexto ke tîmê xelisnayîşî û hemwelatîjî cigêrayîşê xelisnayîşî kerdêne vewrêso diyîne ginabi înan ser. Vewrêso diyîne de cenazeyê 41 kesan binê vewre ra ameyî vetene û badê bi aşman cenazeya xebatkarê adirhewnakerdişî binê vewre ra ameye vetene.

Dima ra xeylê bajaran de erdlerz, laser, torge, ya ke pêroyê dinya girewte binê tesîrê xo Covid-19o ke sere de bajarê Wuhanî yê Çînî de vejîya raşte û swb… xeylê çîyî qewimîyayî. Bobelatê serra 2020î hema zî dewam kenê. Êdî dinya jehr û tesîro xirab o ke merdimîye aye ser de viraşto û virazeno, erzena teber. Ekolojîya dinya bi destê merdimayî yena xirakerdene. Nêweşî û erdlerzî zêdîyenê. Derheqê korona de xeylê îdîayî estê (Tena yew numine. Yeno vatene ke no vîrus labaratuar de ameyo viraştene.) Yanî bi çi hawa beno wa bibo, wina asîyeno ke ena nêweşî bi destê merdimîye virazîyaya û êdî merdimayî ziraranê girdan dana ena dinya.

Ma tiya de tena qala bobelatanê xozayî kerde la wina bobelatî estê ke merdim bi merdiman keno. Tacîz, tecawuz, îstismarê vera domanan, fuhuş… Semedê asîmîlekerdişê merdiman û xirakerdişê demografiya herême zêdîyayîşê cemaatan û swb… xeylê xeylê çîyî estê ke bi nuştişan nêqedîyenê estê. Wexto ke merdim nê çîyan vîneno êdî umudê merdimî ena dinya ra birîyena. Herkes dinyayêka weş û silamet de cuyayîşî heq kena/o. Merdim yew îhtîmal belkî bieşko vernîya bobelatanê xozayîyan bigîro. La merdim bi başî kesîn eşkeno bobelatanê ke bi destê merdiman yeno kerdene, bigedêno. Xirabî ra tu çîyêk nêvejîyeno.

Êdî fek pêroyê xirabîyan ra vera bidêne. Ena dinya bi merdim, dar, xoza, derya, heywan û vilikanê cîya-cîyayan weş a. Goşdarîya vengê başîye bikerêne ke wa dinya biba cayêka baş û rinde. Başî û dinyayêka rink bi polîtîkayan mumkin a. Sîstemê cezakerdişî wa kerdoxan vera nêdo şarî mîyan. Wa tacîz û tecawizkarî cezaya tewr giran bêgêrî û bêrî cezakerdiş.



Ma emserr ameyîşê serra newe bimbarek nêkenê, wa 2021 ma bimbarek bikero ke ma senî 2020î ra saxî xelisîyayî. Homa rehma xo bikero pêroyê merdimanê ke bobelatan de cuya xo vindî kerdî.

Sersala we

pîroz be!

Bi hêviya jiyaneke aştiyane, aram û demokratîk, sala 2021'ê di serî de gelê me, li hemû gelên cîhanê pîroz be.

BALVEREN BELEDİYESİ 1995

Hevşaredarên Gundikê Mêlê

# Sersala we pîroz be!

Bi hêviya rojên xweş û azad em sersala we pîroz dikin û hêvî dikin ku li şûna van rojên zor û zehmet rojên xweş û azad bibin para we. Her wiha em hêviya tenduristiyeke baş û saxlem ji bo gelê xwe dikin, di vê dema belavbûna nexweşiya koronayê de ku jiyana me zor û zehmetir kiriye. Wekî din jî em bang li gelê xwe dikin ku heta ji destê wan were xwe ji vê nexweşiyê biparêzin. Bi hêviya rojên xweş, em sersala we pîroz dikin her sal bi xêr û xweşî li we û malbat û xizim û dostên we vegere...

Patnos BELEDİYESİ

Hevşaredarên Patnosê
Muşerref Geçer û Emrah Kiliç

# Sersala we pîroz be!

Bi hêviya rojên xweş em sala nû di serî de li gelê xwe, li hemû gelên cîhanê pîroz dikin.
Bi hêviya ku sala 2021'ê bibe sala azadî, aramî û xweşiyê û bi xwe re aştî û çareseriyeke birûmet bîne. Em hêvî diki, sala nû dawî li kul û derd û azarên me bîne. Bi van hest û daxwazan em sersala gelê xwe pîroz dikim. Sersala we pîroz be û gelek salên xweş û azad bibînin...

SİLOPİ BELEDİYESİ 1960

Hevşaredarên Silopiya û
Endamên Meclisa Şaredariyê

xwebûn

21-27 Kanûn 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 53

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Şeva Yelda

**Piştî ku roj diçe ava û cihê xwe ji şevê re dihêle, malbat li dora sifreyek ku bi gelek xwarin, vexwarin, fêkî û çerezan hatiye xemlandin kom dibin**

Şaswar Mame

Li Kurdistanê û gelek welatên Rojhilata Navîn her sal di 21'ê kanûnê de şeva Yelda tê pîrozkirin. Ev cejin ku li hinek herêman Şeva Çile (Şevçile) jî jê re tê gotin, tê wateya şeva herî tarî û dirêj di salê de li Kurdistanê. Di heman demê de destpêka demsala zivistanê ye. Terza pîrozkirina şeva Yelda li gor gel û baweriyan diguhere, lê meriv dema bala xwe bide hemûyan yekbûna koka wê dibîne. Şeva Yelda niha zêdetir li rojhilat û başûrê Kurdistanê tê pîrozkirin. Piştî ku roj diçe ava û cihê xwe ji şevê re dihêle, malbat li dora sifreyek ku bi gelek xwarin, vexwarin, fêkî û çerezan hatiye xemlandin kom dibin. Piranî jî ew xwarin û vexwarin in ku di herêma ku lê dijîn de tên berhemanîn; mînak hinar, gûz, tirî, mewîj, hêjîrên hişk û şêrînahî. An jî hemû berhemên di bihar, havîn û payîzê de ji bo zivistanê hatine komkirin. Her wiha di vê şeva tarî de mûm tên pêxistin. Pirtûkên helbestên klasîk cihê herî bi heybet li ser sifreyê digirin. Li cem kurdan herî zêde dîwana Nalî di şeva Yelda de tê xwendin. Bi taybetî jî helbesta wî ya bi nav û deng "Şewî Yelda":

*Şewî Yelda ye, ya deycur e emşew*
*Ke dîdem dûr le to bênûr e emşew?!*
*Dilim wek hakimî me'zûle, qurban!*
*Xelatî weslî toy menzûr e emşew*
*Dilîş mayil be dîdey to ye, boye*
*Le min wehşî u remîd e u dûr e emşew*
*Ke toy şay keç kulahî dîde mestan,*
*Çi bakim qeyser u fexfûr e emşew?!*
*Le xew helsawe, ya aloz e çawit?*
*Hemîşe waye, ya mexmûr e, emşew?*
*Suruşkim neqşî çawî to dekêşê*
*Cêgem ser darekey mensur e emşew*
*Musulmanan depirsin halî Nalî*
*Le kuncî bêkesî mehcûr e emşew*

Tevî xwendinê helbestan stran jî tên gotin. Amûrên wekî tembûr, bilûr, dutar û sêtar cihekî girîng digirin. Her wiha di vê civatê de gelek axaftin li ser mijarên curbicur tên kirin. Li hinek herêman saziyên çandî bernameyek berfireh ji bo pîrozkirina vê cejnê saz dikin û gelek kes bi rengên xwe yên gelêrî tev li dibin, lê zêdetir malbat di nav xwe de Şeva Yelda pîroz dikin.

Yelda çandek hevper e di nav gelên dêrîn ên axa Mezopotamya û çiyayên Zagrosê de; gelên bawermend bi mîtrayîzmê ku dîroka wê vedigere berî bi hezaran salan.

Peyva Yelda bi eslê xwe peyvekwe-suryanî ye. Tê wateya jidayikbûnê. Li gor baweriya mîtrayîzmê di vê şeva tarî û dirêj de Mîtrayê xwedayê roj û ronahiyê ji dayik dibe.

Mirovên dêrîn ên li ser vê axê berî hezaran salan li pey dîtina rê û rêbazên curbicur bûne ji bo jiyanê. Ji bo xweparastin û peydakirina debara xwe li derdora çiya û newal û deştan belav bûne.

Mirovên wê çaxê li gor lêgerînên xwe hêdî hêdî kûrtir bûne û zêdetir li pey zanîn û hînbûnê bûne. Tevî ku ji bo cilûberg, xwarin û vexwarinê çavê wan li erd û avê bûye, lê gavek mezintir davêjin û berê xwe didin esman jî. Berê xwe didin esmanê ji bo fêmkirin ji xweza û stêrknasiyê ne ji bo lavakirin û îbadetê. Mebesta wan ew e karûbarên xwe li gor xwezayê û şertûmercên xwezayê bi pêş ve bibin. Jixwe kar û jiyana wan ku xwedîkirina ajal û çandinî bûye, bi her awayî girêdayî xwezayê bûye.

Lêgerînên mirovên li ser vê axê û berhemên vê lêgerînê hêdî hêdî di çarçoveya sîstemeke hizrî de kom dibin. Piştre wekî Mîtrayî tê bi navkirin. Tu dikarî îro bibêjî Mîtra, Yarsan, Êzidî an her bawerî û çandeke din ku ji vê kokê tê. Di vê çandê mîtrayî de, piştî ku mirovên wê demê li pey heqîqet û zanistê lêkolîn û têkoşanên mezin kirin, ji bo parastina xwe û nasîna xweza û stêrkan sîstemek ava kirin ku îro em dibî bi dûr jê re dibêjin Newroz û Çileyê zivistanê.

Naveroka peyama mîtrayîzmê ev e: Meriv bi berfirehî li derdora xwe binêre û sîstemek ji bo birêvebirina jiyana xwe ava bike ku hem xwezanas be hem jî mirovparêz.

Şeva Yelda dibe ku bi zahîrî cejnek sembolîk be, lê bi naverok gelek watedar e. Bi taybetî lêgerînên mirovên wê demê li pey fêmkirin ji xwezayê, hînbûna zanist û xwerêxistinkirinê gelek balkêş e. Ev ramanên wan bûye bingeha avakirina hizreke hevbeş ji bo komkirina eşîrên Mad û avakirina fedrasyona Medyayê.

Ev lênêrîn û xwerêxistin ku di astek bilind a fêmkirina mirovatiyê de ye, li ser axa welatê me ava bûye û ber bi dinyaya îro ve belav bûye, lê ev belavbûn ne bi darê zorê û ne bi zebrê şûr û tîran bûye.


Ev belavbûn di encama kêrhatin û girîngiya zanist û ramanên mirovên mîtrayî bûye. Niha ger em bi çavek berfireh li dinyayê binêrin, çanda mîtrayî pir geş xuya dike.

Bi taybetî piştî ku mîtrayîzm derbasî împaratoriya Romayê dibe û wekî ola fermî tê pejirandin, mîtrayîzm zêde ber bi Ewropayê ve belav dibe. Gelek sembol û hêmanên çandê bi xwe re dibe û bandor li çand û gelên din dike.

Ev bandor ewqas mezin bû, piştî ku baweriya xiristyanî di împratoriya Romayê de cihê mîtrayê digire, ev çand wenda nabe û derbasî ola xirîstyaniyê dibe. Heta niha jî rengên zanista stêrknasiyê û cejnên ev gelê dêrîn li Kurdistanê di salname û pîroziyên dinyaya îro de aşkera ne. Li navê mehên September, October, November û December yên vê serdemê binêrin ku koka wan a latînî ye vedigere ser meha Heftem, Heştem, Nehem, Dehem. Sedema vê jî ew e di wê çaxê de li Romayê jî meha yekê ya salê Newroz (Xakelêwe) ya me bûye. Ji ber vê ye heta îro jî September wekî meha Heftem reng vedide û November dibe Nehem. Bala xwe bidinê hûn ê bibînin Nehem (Noyem) - Novem, Dehem (Deyem) - Decem çiqas nêzî hev in.

Jixwe hûn dizanin piştî serhildana ola xiristyanî salnameya Julian ber bi salnameya Gregorian ve guherî. Bi vî awayî şeva Yelda ji şeva jidayikbûna Mîtra derbasî şeva jidayikbûna Îsa bû. Ji ber pirsgirêkên di salnameya Gregorian de rojbûna Îsa ji bilî ku bikeve şeva yekê ya salê yan di heman wexta rojbûna Mîtra de bimîne, dikeve 25'ê kanûnê. Yanî koka cejna rojbûna Îsa ji çanda mîtrayîzmê û heman Şeva Yelda ya gelên dêrîn a axa Kurdistan û Mezopotamyayê tê.

Şeva Yelda ya Mîtra û mîlada Mesîh (Rojbûna Îsa) li we pîroz be.










Ayhan Erkmen

# Bager

Her çiqas zor û zehmet be jî de zivistan gotî; hewce ye ku bi ba û bager be. Berf ku têra xwe nebare, mirov di qepeçê de nemîne, xêra wê çi ye. Tecrûbeyên mezinan, mîrateya hezar salan e; zivistan ku sayî derbas be, ji havînê çiqas jî baran bibare, xêra wê tune, erd ku avê têr venexwe yê tu zindiyî têr neke û xela yê rabe.

Li zivistanên berê, berf ku bi rojekê, an jî bi roj û danekê bi hemdê xwe bibariya û dû re ba rabûya, dibû bager, wî bayî berfa bestan dida pêşiya xwe û dihanî nav gundan tijî dikir. Wisa dibû ku derî û pencere dixitimîn. Xaniyên gunda li gorî rojên wiha hatibûn çêkirin, hemû di ser hev da bûn. Tim deriyekî biçûk di navbera malê û exur de hebû. Gava ku di vî derî re derbasî êxur dibûn, di deriyekî êxurî dinê re jî derbasî kadînê dibûn. Derê kîlerê di sivderê re vedibû û pêşiya sivderê jî ji bo bagerê bigire, holikek dihat çêkirin. Heya bagerê datanî, me berf diheland û ava berfê vedixwar.

Di rojên bagerê de çûyîn û hatina cîranan jî dahate birîn. Ya nedihat kişandin û mirov, bi taybetî jî em zarok bêzar dikirin ew yek bû. Yên di wê bagerê de bihatana hewariya malbatekê û ji derve ve derî û pencerên xitimî vekirana, hema bêjin qey derê bihuştê ji malbatê re vedikirin. Ew kes dibû lehengê rojê û mêvanê xwarina wî dianî. Para herî birûn didan ber wî/ê.

Xwarinên rojên bagerê hema bêjin diyar bûn. Ji bo taştêya serê sibê, kartolên pijandî an jî kelandî, rûnê malê, penêrê çîçal, dimisê kolika dihat sifrê. Danên din, girsra kesmaşê, xengel, xaşîl, dûrme û savar an jî qaz dihat çêkirin. Ew xwarinên bisebze, mebze çêdibin li ba me tunebûn. Bawer im ew mirov germ jî nagirin. Min xwe jî ew xwarin, dema bo xebatê ji gund derketim û çûm xeribiyê, li wan deran xwar. Lê binêrin, li ba me gotineke meşhûr heye, dibêjin "Gava ku te savar bi lepan xwar û rûnê wê heya enîşka te nerijiya, xêra wê xwarinê tune."

Di bageran de bûyera herî zehmet şîn bû. Mirovek bimira, mêran kulav bi xwe re dibirin goristanê. Cihê gorê diyar dikirin, ji bo bagerê bigire, dora wê bi kulavan ji çaralî dipêçan û dor bi dor bi saetan dikolandin. Rehma xwedê li wan be, lê di rojên wisa de spartina miriyan pir zehmet bû. Yê herî xêrxwaz û ji vî şixulî xwe şûn ve nedida rehmetiyê Apê Ûsiv bû. Ew ji berî her kesî li goristanê bû.

Yek jî di bageran de rêwîtî jî zehmet bû. Barê rojên bageran li ser milê gundên serêyan bûn. Li gundên serêya, her malek qonaxek bû. Şêniyên gundên jêrîn jî bo rojên bageran, bi şêniyên van gundan re merivatiyê datanîn; dibûn xinamî, kirîv an jî birader. Dema di rê de diman bê minet, wekî malên xwe diçûn qonaxên xwe. Bi wî awayî tekîliyên navbera gundan jî şîrîn û xurt bûn.

Hesinkarê gundê me Apê Emer ji gundê kêlekê, ji Qeleqela Baro bû. Serê siba dihat û esra kûr vedigeriya gundê xwe, lê di rojên bageran de venedigeriya gundê xwe; şixulê kê ku li ber destê wî bûya, dibû mêvanê wê malê. Dema ku derê kadîna me çêdikir, çend roj li ser hev bager çêbû û ew jî bû mêvanê me. Xwedê jê razîbe qet dest vala nedihat. Ser riya xwe ji dikana Xalê Niho bi kîloyan sêv û porteqal dianî. Diya min a belengaz li ber xwe diket, digot "Birayê Emer eybe, bes e, neyîne" lê ji kê re dibêjî… Lê xwaş helal be, diya min jî ji şermana her şev mirîşkek an jî qazek çêdikir û hêt jî para Apê Emer bû.

Dema me porteqal dixwar digot "Şerm nekin bixwin, bixwin mîna malê xwe bixwin." Îja di ser da jî zêde dikir diqot "Qalikan jî biavêjin sobê, bila bêhna wan jî cîranan bixwe."

Me xwe jî ji dikana Xalê Niho tişt deyn dikirin û bavê min serê mehê dema meaşê xwe distand deynê Xalê Niho dida, lê me qet ewqas sêv û porteqal li ser hev nestandibûn. Bavê min dema serê mehê diçe deynê Xalê Niho bide dibîne çi, Xalê Emer hemû sêv û porteqal li ser navê bavê min deynkirine.

Bavê min xwe dixwar, lê ya xêr ew bû, sêv û porteqal me xwaribû.